



K. T.

Unîversîteya Artûklûyî ya Mêrdînî Enstîtûyê Ziwananê Ganîyan yê Tirkîya
Şaxê Mayzanistê Ziwan û Kulturê Kurdan

Tezê Masterî

**ZAZAKÎ DE KATEGORÎZEKERDIŞÊ
EDATAN Û METNANÊ ZAZAKÎ RA
NIMÛNEYÎ**

Muhammed Emin KAÇAN

14711015

Şêwirmend

İbrahim BİNGÖL

Mêrdîn 2018

K. T.

Unîversîteya Artûklûyî ya Mêrdînî Enstîtûyê Ziwananê Ganîyan yê Tirkîya
Şaxê Mayzanistê Ziwan û Kulturê Kurdan

Tezê Masterî

**ZAZAKÎ DE KATEGORÎZEKERDIŞÊ
EDATAN Û METNANÊ ZAZAKÎ RA
NIMÛNEYÎ**

Muhammed Emin KAÇAN

14711015

Şêwirmend

İbrahim BİNGÖL

Mêrdîn 2018

KABUL VE ONAY

Muhammed Emin KAÇAN tarafından hazırlanan “Zazacada Edatların Kategorize Edilişi ve Zazaca Metinlerden Edat Örnekleri” adındaki çalışma, 18/01/2018 tarihinde yapılan savunma sınavı sonucunda jürimiz tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı, Kürt Dili ve Kültürü Bilim Dalında yüksek lisans tezi olarak oybirliği ile kabul edilmiştir.

[İmza]

Prof. Dr. Kazım TANRIVERDİ

[Unvanı, Adı ve Soyadı] (Başkan)

Dr. Doç. Dr. Nurettin Beltekî

Öğr. Gör. İbrahim Bîrgeç

Onay
Enstitü Müdürü

Doç. Dr. M. Nesim DORU

VATEYO VERÊN

Zazakî de çarçewayê edatan tam nêvirazîyaya. Yanî çarçewayê edatanê ke tam bi muştêrekî ameya qebulkerdiş çinî ya. Sey sazîyêk ra edatî nêameyê nuştiş û sey qaîdeyan çîyêk nêameyo qebulkerdiş. Tena tayê şexsîyetan bi ked û xebata xwu tayê çî ardê heta sewîyeyêk. No ware de “Grûba Xebate ya Vate”yî sey sazîyêk xebate kerda la aseno ke derheqê edatan de xebata înan hema nêmcet a. Grûba Xebate ya Vateyî derheqê edatan de wina vato: “**Kirmanckî de edatî hîrê çeşîdî yê û çekuyanî bînan ra cîya nusîyenê. Tîya ma çend nimûneyan nusênê.**” Yanî aseno ke hetê na sazîye ra zî xebatêka tam hîra nêameya kerdiş. Grûbe bi xwu vato: “**Tîya de ma çend nimûneyan nusnenê.**” Xwura aseno ke xebate hema nêmcet a û dewam kena. Yanî heme çeşîdê edatan nêameyê nuştiş û nêameyê tarîfkerdiş. Hetta grûbe hema edatî tarîf bîle nêkerdê. Loma ganî siba roj edatan ser o xebatêka hina hîra bêro kerdiş. Xwura şertanê bêdewletî û bêperwerdeyî de kes nêşkeno zaf qalê muştêrekî yê zîwan û gramerî bikero. Loma sewîyeyê xebatê gramerî yê zazakî malesef hema nizm a. La ganî merdim ked û xebata tayê kesan zî xwu vîr ra nêkero. Hetê heskerdoxanê zîwanî ra nê kesî xwura naskerdeyê.

Derheqê gramerê zazakî de xebatêkê sey kitabî çap bîyê tayê. Na xebate de, bi taybetî xebatêkê sey kitabî çap bîyê înan ra îstîfade ameyo kerdiş. Xebatê ke nê kitabî de derheqê edatan de ameyê kerdiş, nê xebatî ameyê têvernayiş û derheqê na babete de kamî çî vato, çî nuştî rîz bîyê. Kitabê gramerî ê yê ke înan ser o xebate ameya kerdiş nê yê: **Ro Ser Zarawayâ Kirmanckî Xebata Gramerî** (Sebahattîn Gultekîn), **Dersê Zîwanî, Kirdkî/Kirmanckî/Zazakî/Dimilkî** (Roşan Lezgîn), **Türkçe Açıklamalı Kirmancca/Zazaca Dil Dersleri** (Deniz Gunduz), **Türkçe Açıklamalı Kirmancca(Zazaca) Gramer** (Munzur Çem), **Kurmancca ile Karşılaştırmalı Kirmancca (Zazaca) Dilbilgisi** (M. Malmîsanij), **Rastnuştişê Kirmanckî (Zazakî)** Gruba Xebate ya Vateyî, **Gramerê Zazakî** (Fahri Pamukçu) û **Türkçe Açıklamalı**

Zazaca Dilbilgisi (Harun Turgut). Kategorîyê edatan goreyê xebatanê nê kitabana virazîyaya. La nimûneyî cîya bi cîya kitabana ra ameyê arêdayîş.

Ziwanê kurdkî de cîya bi cîya xususîyetê edatan estê. Na xebate de goreyê xususîyetê edatan ra sey “kategorîzekerdişê edatan, goreyê mintiqayan ra farqê edatan, mîyanê metnan de xebitnayîşê edatan”, bi no tewir sernuşteyî virazîyayê. Na xebate, panc sernuşteyan ra ameya meydan.

Beşo yewin û beşo diyîn yê na xebate, derheqê xebatanê ziwannasanê/xebatkaranê ziwani yê kirdan de yo. Yanî nê xebatan de edatî senîn ameyê tarîfkerdiş, senin kategorîze bîyê, farqê nê xebatan çîyo, bi hîrayî malûmat ;ameyo dayîş. Beşo hîrêyin de, goreyê mintiqayan ra farqê edatan ser o vinderîyayo û goreyê nê farqan ra nimûneyî ameyê dayîş. Beşo çarin de zî derheqê edatan de tayê çî yê eluzîyayeyan ser o malûmat ameyo dayîş. Yanî derheqê edatan de çî yê ke baş zelal nêbîyê û qaîdeyanê edatan de farqê ziwannasan/xebatkaranê ziwani çîyo, derheqê nê babetan de malûmat ameyo dayîş. Bi taybetî farqê kategorîyan, farqê qaîdeyan û farqê çekuyan (kamcîn çekuye edat a yan edat nîya) ser o vinderyayo. Beşê pancine de, (giranîya xebata nê tezî nê beşî ser o ya) kitabânê zazakî ra nimûneyî ameyê komkerdiş û nusyayê. Kitabê ke te ra nimûneyî ameyê girotiş babeta înan cîya bi cîya ya. Bi taybet cîya bi cîya babetî weçînîyayê. Sey “Mewlidê Kirdî” yê Mela Ahmedê Xasî, sey “Folklorê Ma Ra Çend Nimûneyî” yê M. Malmîsanijî, sey “Memê Alan” Roger Lescot, sey kovaranê “Nûbihar û Şewçîla”yî, kitabê hîkayeyan ûsb. Reyna, nimûneyî bi taybet hem metnanê kahanan ra hem zî metnanê neweyan/peyînan ra weçînîyayê.

Înşela siba roj, na xebate seba edatan, seba gramerê kirdan, seba raverşîyayîşê ziwani kirdan faydeyê xwu bibo. Eger ziwani gramerê kirdan rê qasê sereyê derzenî faydeyê mi bibo ez do zerrîweş bibî û xwu bextîyar bivînî.

Na xebate de seba hetkarî, ez şewîrmendê xwu Mamosta Dr. Îbrahîm Bîngol rê zaf sipas kena. Mamosta Îbrahîmî sere ra heta peynî hetkarî mi kerde, mi dir zehmetî ante û bi şîroveyanê xwu raye nîşanê mi da. Ziwanê û tarîxê kurdan de Mamosta M. Malmîsanijî sey çilayê şewe ma roşn kerdî, ma bi her awayî ey ra îstîfade kerd. Mamosta M. Malmîsanijî rê zor sipas. Nuştiş û wendişê kurdkî de Roşan Lezgînî her gavî hetkarî da ma, cesaret da ma, ma teşvîk kerdî. Heskerdişê ziwani de keda mamosta

Roşan Lezgînî ma ser o zaf a. Loma ez zî Roşan Lezgînî rê zaf sipas kena. Raştnuştiş û raştwendîşê zîwanê kirdan ra heta zanayîşê folklorê kirdan keda nê mamostayan ma ser o esta. Reyna, hevalê mi Yrd. Dr. Mehmet Rêzan Ekîncî ke her gavî û bi her awayî hetkarî da mi, moral û motîvasyon da mi, mamosta Rêzanî rê zor sipas kena. Seba kilmnuştişê nê tezî ke zazakî ra açarna îngilîzkî ser Doç. Dr. Mehmet Behzat Ekîncî rê û seba mîzanpajî Weysel Yıldızhanî rê sipas kena.

Muhammed Emin KAÇAN

Mêrdîn 2018

KILMÎYE

Na xebate de, di kirdkî de derheqê edatan de xebatê ke ameyê kerdiş, kombîyê û sey tabloyêk, sey şemayêk têver de ameyê nîşandîyayîş. Yanî tîya de ameyo waştîş ke edatan ser o çî xebatî ameyê kerdiş, ferqê nê xebatan çîyo, edatî senî kategorîze bîyê, derheqê edatan de standardêk esto yan ney wa zelal bibo. Zereyê tezî de zafane nê çîyan ser o xebate ameya kerdiş. Reyna, derheqê edatan de tayê çîyê eluzîyayeyî estê. Nê çî yew bi yew ameyê nuştîş ke siba roj nê çîyan ser o şîroveyî û rexneyî bêre kerdiş ke edatî gamêk zî ver bi standardîzasyonî wa şêrê. Beşo peyîn de, edebiyatê kirdan ra kitabî/metnî ameyê wendiş û edatê ke ey metnan de derbas bîyê kategorîya edatan de sey nimûneyan nusyayê.

Na xebate de ameyo waştîş ke, kirdkî de xebatêkê ameyê kerdiş yewbînî gêrenê yan ney û ferqê nê xebatan çî yo wa tesbît bibo. Ê edatî seyîn tarîf bîyê, zereyê metnan de senîn ameyê xebitnayîş, hetê manayî û gramerî ra granîya înan çî ya wa bizanîyo. Xwura xebate zafane no çarçewe de ameya kerdiş.

Çekuyê Kildî: Edatî, Veredatî, Peyedatî, Veredatî û Peyedatî Pîya/Bazineedatî, Kirdkî, Gramerê Zazakî

ÖZET

Bu çalışmada Kürdçe'nin Zazaca lehçesinde, edatlar üzerine yapılan çalışmalar bir araya getirilerek tablo halinde bir bütün olarak gösterilmiştir. Edatlar üzerinde hangi çalışmaların yapıldığı, bu çalışmalar arasında ne gibi farklar bulunduğu, edatların nasıl kategorize edildiği, edatlar üzerine bir standardizasyon olup olmadığı ortaya konulmaya çalışılmıştır. Tezin içeriğinde daha çok bu konular üzerinde durulmuştur. Dilbilimcilerin Zazakî lehçesindeki edatlar ile ilgili uzlaşmadığı ya da farklı fikirleri bulunduğu, çözüme kavuşmamış bazı noktalar bulunmaktadır. Bu çalışma ile Zazakî lehçesindeki edatlar ile ilgili farklı yaklaşımlar ortaya konularak, Zazakî lehçesinin bir standardizasyona doğru ilerlemesi amaçlanmıştır. Son bölümde, Zazaki lehçesinde yazılmış metinler taranarak bu metinlerde geçen edatlar tespit edilmiş; her edat ayrı ayrı tasnife tabi tutularak örnekler şeklinde dizilmiştir.

Bu çalışma ile Zazakî lehçesindeki edatlarla ilgili yapılan çalışmaların birbirine uyup uymadığı ve farklarının neler olduğu tespit edilmeye çalışılmıştır. Zazakî lehçesinde edatların nasıl tarif edildiği, metin içerisinde nasıl kullanıldığı, anlam ve gramer açısından edatların önemi gösterilmeye çalışılmıştır.

Anahtar Kelimeler: Edatlar, Önedatlar, Ardedatlar, Önedat ve Ardedat Birlikte, Zazaca Grameri

ABSTRACT

In this study, the researches on prepositions in the Zazakî dialect of Kurdish language have been collected and shown together in a table. The main aim of the study is to reveal the researches made on the prepositions, the differences among them, the way they have been categorised, and whether there is any standardisation on them. Considering that there are still some debates on the prepositions, another aim of this study is to lead to a platform where related discussions can be made and a standardisation on the matter might be achieved. For this purpose, nearly all disagreed issues and points have been determined and mentioned one by one. In the last chapter, having scanned the texts in the Zazakî dialect, all prepositions therein determined and they have been presented in examples.

Here, the studies on the prepositions have been categorised and compared. The suitability and differences among them have been shown. In this context, it is aimed to show how the prepositions have been defined in the Zazakî dialect and what significance they have in terms of meaning and grammar.

Key Words: Preposition, Postposition, Circumposition, Zazakî Grammar.

TEDEYÎ

VATEYO VERÊN.....	I
KILMNUS.....	IV
ÖZET.....	V
ABSTRACT	VI
TEDEYÎ	VII
LÎSTEYÊ TABLO	X
DESTPÊK.....	1
BEŞO YEWIN	5
XEBATANÊ ÇEND ZIWANNASAN DE EDATÎ.....	5
1.1 XEBATA SEBAHATTÎN GULTEKÎNÎ.....	5
1. 2. XEBATA ROŞAN LEZGÎNÎ	7
1. 3. XEBATA GRUBA XEBATE YA VATEYÎ.....	8
1. 4. XEBATA DENİZ GUNDUZÎ.....	9
1. 5. XEBATA MUNZUR ÇEMÎ	10
1. 6. XEBATA FEXRÎ PAMÛKÇÛYÎ.....	16
1. 7. XEBATA HARÛN TÛRGÛTÎ.....	19
1. 8. XEBATA M. MALMÎSANIJÎ.....	21
BEŞO DIYÎN	29
2. ZAZAKÎ DE KATEGORÎZEKERDIŞÊ EDATAN	29
2.1. KATAGORÎYA ROŞAN LEZGÎNÎ, YÊ DENİZ GUNDUZÎ, YÊ M. MALMÎSANIJÎ, YÊ FEXRÎ PAMÛKÇÛYÎ Û YÊ GRÛBA XEBATE YA VATEYÎ	29
2.2. KATAGORÎYA SEBAHATTÎN GULTEKÎNÎ.....	30
2.3. KATAGORÎYA MUNZUR ÇEMÎ	31
BEŞO HÎRÊYIN	32
3. GOREYÊ MINTIQAYAN RA VURNAYÎŞÊ EDATAN.....	32
BEŞO ÇARIN	38

4. DERHEQÊ EDATAN DE TAYÊ ÇÎYÊ ELUZÎYAYEYÎ.....	38
4.1. XELETNUŞTIŞÊ ÇEKUYANÊ “cira (ci ra), tera (te ra) û xwura (xwura)” YÎ	38
4.2. TÊKILÎYA EDATÊ “bi”yî û EDATÊ “pê”yî.....	39
4.2.1. Nimûneyê Edatê “bi”yî.....	41
4.2.2. Nimûneyê Edatê “pê”yî.....	43
4.3. DERHEQÊ EDATÊ “pê”yî û ZEMÎRÊ “pê”yî DE	45
4.4. BAZINEEDATÊ “beyntarê ... de”yî.....	46
4.5. EDATÊ “di de”yî.....	49
4.6. EDATÊ “ro”yî	50
4.7. PEYEDATÊN “ra” û “ro”yî	51
4.8. DI EDATÊ KE AMEYÊ TÊVER	52
4.9. EDATÊ “gore/goreyê”yî	54
4.10. VEREDATÊ “vera”yî	55
4.11. VEREDATÊ “verê/verî”yî.....	55
4.12. VEREDATÊ “bahdê”yî	56
4.13. ÇEKUYA “zî”yî.....	56
4.14. ÇEKUYA “heta/hetanî”yî	56
4.15. ÇEKUYA “reyde”yî	57
4.16. EDATÊ NEGATÎFÎ “bê, me, nê, nî, ni”yî.....	57
4.17. TAYÊ ÇEKUYÊ KE SEY GRÛBE NUSYENÊ.....	58
BEŞO PANCIN	60
5. METNANÊ ZAZAKÎ DE XEBITNAYÎŞÊ EDATAN RA NIMÛNEYÎ.....	60
5.1. NIMÛNEYÊ VEREDATAN	61
5.1.1. bê:	61
5.1.2. bi:.....	61
5.1.3. bi:.....	62
5.1.4. di:.....	62
5.1.5. fenê/sey:.....	63
5.1.6. hendê:.....	64
5.1.7. heta/heyâ/hetanî:.....	64
5.1.8. pê:	65
5.1.9. qandê/seba/semedê:	66
5.1.10. qasê:.....	66

5.1.11. ro:	67
5.1.12. tewlî/tevê:	67
5.1.13. ver bi:	68
5.2. NIMÛNEYÊ PEYEDATAN	68
5.2.1. a:	68
5.2.2. de:	69
5.2.3. dir/rejde/ya/de:	70
5.2.4. ra:	70
5.2.5. rê:.....	71
5.2.6. ro:	72
5.2.7. ser o:	73
5.2.8. wa/ya:	74
5.3. NIMÛNEYÊ BAZINEEDATAN.....	74
5.3.1. beyntarê/beynateyê/mabênê/mîyanê/orteyê/arayê ...de:	74
5.3.2. bi ... ra:	75
5.3.3. bi ... wa:.....	75
5.3.4. di ... de:.....	75
5.3.5. herinda (ca) ... de:	76
5.3.6. hetê ... ra:	76
5.3.7. pey ... de:	77
5.3.8. peyê/pê/peynî ... ra:	77
5.3.9. qandê ... rê:	77
5.3.10. semedê ... ra:.....	78
6. PEYNÎYE.....	80
ÇIMEYÎ	84

LÎSTEYÊ TABLO

Tablo 1: Tabloya M. Malmîsanijî Veredatî.....	36
Tablo 2: Tabloya M. Malmîsanijî Peyedatî.....	37
Tablo 3: Tabloya M. Malmîsanijî Veredatî û Peyedatî Pîya.....	38

DESTPÊK

Hetê nuştişî ra mîyanê kurdan de kirdî zaf erey mendê. Çend metnê verênî nêrê hesebnayîş tarîxê nuşteki yê kurdan nê 20-30 serranê peyînan de dest pêkerdo. Xebata gramerî zî heman serran de dest pêkerda. Nê serran de xebatê edebîyatî û ziwani zaf ameyê kerdiş. Zaf kitabî çap bîyê. La nê xebatî hema newe û xam ê. Nê xebatan ser o hema şîrovevî û rexneyî nêameyê kerdiş. Verê her çî, zivan û gramerê kurdan hema mekteban de nêameyo tedbîqkerdiş. Ganî her çeşidê edebîyatî bêro nuştiş, çarçewayê gramerî belî bibo, nê xebatî rexne bibê û xeletîya înan raşt bibo. Dima zî nê xebatî mekteban de tedbîq bibê û standardîze bibê.

Nê serranê peyînan de gelêk xebatê gramerî ameyê kerdiş la standardîzasyonêkê înan çinî yo. Îzafeyî nêniştê ro. Ganî zereyê gramerî de her îzafe, her prefiks-suffiks, her xale bêro şîrovekerdiş. Her çekuye cayê xwu yo raşt bivîno û uca de ronîşo. Ganî game bi game ruknê gramerî virazîyê. Kerra bi kerra dîwarê ey bêrê virastiş û bi rengêko delal bêrê xemilîyayişî. Loma çîyêkê derheqê edatan de ameyê nuştiş na xebate de ameyê têhet. Armanc, edatî hina zî raşt bêrê xebitnayîş û hina zî standardîze bibê. Gava çîyê kêmaneyî û eluzîyayeyî vejîyê meydan do rexne û şîrovevî dima ê zî raşt bibê. Na xebate zî çarçewayê nê fikran de virazîyaya.

Kitabanê gramerî yê kirdkî de edatî hema-hema seypê ameyê tarîfkerdiş, la tayê xebatkaranê ziwani edatî bi ziwani tirkî tarîf kerdê, tayê înan zî bi lehçeya zazakî tarîf kerdê. Malmîsanijî, Deniz Gunduzî, Munzur Çemî û Harûn Tûrgûtî edatî bi ziwani tirkî tarîf kerdê. Sebahattîn Gultekînî û Roşan Lezgînî edatî bi zazakî; Fexrî Pamûkçûyî zî hem bi tirkî hem zî bi zazakî tarîf kerdê. Gruba Xebate ya Vateyî edatî tarîf nêkerdê. Sebahattîn Gultekînî edatan ra sey kurmancan vato “daçekîy”, Fexrî Pamûkçûyî vato “payokî” û ê bînan vato “edatî”. Mi zî “veredatî û peyedatî pîya” sey kurmancan çekuyê “bazineedatî” tercîh kerde. Xebatkarê ziwani yê ke gramerê zazakî ser o xebitîyayê edatî wina tarîf kerdê:

Sebahattîn Gultekînî wina tarîf kerdê: **“Daçekîy çekûyêy bêwate yê. Çekûbiyayîşê daçekan gureyê înan ra wo. Qabo ke di miyanê rista de bi gureyê xo bica benê çekûy yenê hesebnayîş.”**¹

Roşan Lezgînî zî wina tarîf kerdê: **“Çekuyê ke bi tena sereyê xo yew manaya xo çin a, la gama ke mîyanê cumle de çekuyan reyde yenê têhet, yew wezîfe gênê û mîyanê terman de mana virazenê ra vanê edat. Kirdkî edatî tim cîya nusîyenê.”**²

Fahrî Pamûkçûyî wina vato: **“Payokî³ yan ver dê naman dî, yan zi pey dê cî dî yenê û hallanê cî belî kenê. Payokî qisekên essli niyê, ew ne zew nami, ne zew kerdeni, ne zi zew çiyeki temsil nêkenê. Zû payok xwoseri mahna ya cî çiniya; na ancax, zewna name ya piya kî bêro qiymet gêna.”**⁴

Deniz Gunduzî edatî bi no tewir tarîf kerdê: **“Kendi başlarına anlamı olmayan, cümle içinde kullanıldığı görevle anlam kazanan ve kavramlar arasında anlam ilgisi kurmaya yarayan sözcüklerdir. Edatlar sözcüklerden ayrı yazılırlar.”**⁵

Hetê Munzur Çemî wa no awe ameyê tarîfkerdiş: **“Kendi başlarına anlamı olmayan ancak bir kelime ile birlikte cümlede yer alarak o kelime ile başka kelimeler arasında ilgi oluşturan, ona anlam kazandıran sözcüklerdir.”**⁶

Malmîsaniyî zî wina tarîf kerdê: **“Bunlar anlamlı sözcükler ve sözcük gruplarıyla, yahut cümle içinde anlam ilgileri kurmak için kullanılan sözcükler olup anlamları öbür sözcüklerle belirginleşir.”**⁷

Harûn Tûrgût: **“Tek başına açık bir anlamı olmayan, cümle içinde sözcükler arasında anlam ilgisi ve uygunluğu kuran sözcüklere edat denir.”**⁸ Seke

¹ Sebahattîn Gultekîn, **Ro Ser Zarawaya Kirmanckî Xebata Grameri**, Weşanên Enstituya Kurdî ya Stanbolê, İstanbul 2010, r.75.

² Roşan Lezgîn, **Dersê Ziwani**, Weşanxaneyê Roşna, Diyarbekir 2012, r.52.

³ Çekuya **payokî** manayê edatî de ameya xebitnayîşî.

⁴ Fahrî Pamukçu, **Gıramerê Zazaki-Zuwanrêznayî**, Weşanxaneyê Tîjî, İstanbul 2001, r.163.

⁵ Deniz Gündüz, **Türkçe Açıklamalı Kürtçe Kirmanca/Zazaca Dil Dersleri**, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul 2013, r.154.

⁶ Munzur Çem, **Türkçe Açıklamalı Kirmanca (Zazaca) Gramer**, Deng Yayınları, İstanbul 2013, r.198.

⁷ M. Malmîsaniyî, **Kurmanca ile Karşılaştırmalı Kirmanca (Zazaca) Dilbilgisi**, Vate Basın Yayın Dağıtım (Weşanxaneyê Vateyî), İstanbul 2015, r.145.

⁸ Harun Turgut, **Türkçe Açıklamalı Zazaca Dilbilgisi**, (Weşanxane çini yo), Almanya 1997, r.165.

cor zî aseno xebatkare ziwani yê ke gramerî ser o xebitîyayê, bi muşterekî tarîfkerdişê edatan ser o wina vato: **Bi sereyê xwu manayê înan çinî yo. Zereyê cumleyî de têkilîya çekuyan virazenê û hem mana danê cumleyî hem zî ziwani hetê gramerî ra tamam kenê.** Feqet no tarîfkerdişê edatan, hetê tayê çekuyan wa tam cayê xwu nêgêreno. Çimkî tayê çekuyî ke seba nimûneyan ameyê nuştîş bi sereyê xwu bi mana yê. Yanî sey çekuyanê bînan/normalan manayê înan esto. Loma nê çekuyî û tarifê edatan yewbînan nêgêrenê. Heman çîyo eluzîyaye lehçeya kurmanckî de zî esto. Kurmanckî de zî gelêk çekuyê ke bi manayê, yanî manayê xwu esto sey edatan ameyê nuştîşî. Derheqê nê çî de Qanatê Kurdo kitabê xwu yo “**Rêzimana Kurdî Kurmancî-Soranî**” de bahs kerdo û vato, tayê çekuyî ke eslê xwu de name yê la manayê xwu ra dûrî kewtê û rolê edatan girewto.⁹ Mesela tayê çekuyî kitabê Qanatê Kurdo de sey edatan ameyê nuştîş û bi sereyê xwu manayê înan zî esto. Nimûne; **bin, cem/rex/nik, dewş, dor, jêr, kêlek, nav, nêzik, orte, paş, pêş, ser, şûn, tenişt ...** Mesela gramerê tirkî de zafê nê çekuyan edat nîyê. Heman çî ziwane îngilîzkî de zî esto. Ziwane îngilîzkî ra seba nimûneyî merdim eşkeno nê çekuyan nişan bido; **after, among, behind, between, in, near, over, under ...** Sey cor zî aseno hem lehçeya kurmanckî de (lehçeya soranî de zî nê çî hema-hema eynî yê) hem zî ziwane îngilîzkî de tayê çekuyî bi sereyê xwu wahirê mana yê. Zazakî de goreyê xebatkaranê ziwani ra farqî bibê zî nê çekuyî estê. Zazakî de nê çekuyî bi taybetî bazineedatan de ameyê xebitnayîş. Eger merdim biewno nê rewşî ra merdim eşkeno vajo; belkî siba roj tarîfkerdişê edatan tayê bibedilîyo yan zî tayê hîra bibo. Reyna, na babete de xebatêkê zazakî û kurmanckî ameyê kerdiş merdim bido têver, dima pêro dîyalektanê kurdkî bido têver, ez bawer a do edatî cayê xwu de hina weş ronîşê. Hetta derheqê na babete de merdim eşkeno ziwane îngilîzkî ra zî îstîfade bikero. Çimkî edatê ziwane kurdkî û îngilîzkî zaf nîzdê yewbînan ê. Înşela go siba roj nê xebatî kûr û hîra bêre kerdiş.

Xebatkare ziwani yê kirdan, ê yê ke gramerî ser o xebitîyayê derheqê edatan de hem çîyo, ke ser o muşterekî esta nuşto hem zî tayê çîyê ke yewbînan ra çîya bi çîya yê nuştê. Loma çîyo ke yeno famkerdiş, çarçewayê edatan zaf hîra ya û edatî hema standardîze nêbîyê. Ez wazena ke kamî çî nuşto, bi çî aweyî nuşto wa bieyso. Nê xebatî çendêk nêzdê yewbîni yê yan zî çendêk dûrê yewbîni yê wa bêre zanayîş. Çimkî

⁹ Qanatê Kurdo, **Rêzimana Kurdî Kurmancî-Soranî**, Zülküf Regün (Soranî ra Tadayîşê Kurmancî), Weşanxaneyê Nubiharî, İstanbul 2013, 273, 274.

gamerê kirdan newe virazîyeno. Kamî çî nuşto cayo xwu de yo. La çîyo balkêş no yo; kamî çî nuşto, seyîn nuşto, raşt nuşto yan çewt nuşto zaf dîyar nîyo. Rexne û şîroveyê nê xebatan zaf nêameyo kerdiş. Nê çî mekteban de tatbîk nêbîyê. Loma wa nê xebatî pêro têver de bieysê û derheqê edatanê zazakî de fikrêk bidê.

Bi kirdkî derheqê sîyasetî de, folklorî de, ziwanî de zaf çî ameyo nuştiş. Gelêk kitabê romanen, ê hîkayeyan, ê gramerî çap bîyê. Yanî hetê nuştişî ra edebiyatê kirdan nê serranê peyînan de raver şîyo. Giranîya na xebate zî nê metnanê zazakî de xebitnayîşê edatan ser o ya. Yanî metnan de seba heme çeşîdê edatan nimûneyî tesbît bîyê û nusyayê. Bi taybetî metnê zazakî yê kahanan ra; ma vajin sey **Mewlidê Kirdî** yê Ahmedê Xasî, **Folklorê Ma Ra Çend Nimûneyî** yê M. Malmîsanijî ra nimûneyê edatan weçîniyayî. Reyna goreyê mintiqayan ra farqê edatan ser o xebate ameya kerdiş û bi nimûneyan farqê înan nusyayo. Goreyê gramerê zazakî ra edatî kategorîze bîyê. Derheqê edatan de tayê çîyê elûzîyayeyî estê. Çîyê ke tesbît bîyê ameyê nuştiş.

Zazakî de derheqê edatan de heta nîka tez nêameyo nuştiş. Çend kitabên gramerî û tekstan de edatî tarîf bîyê û derheqê edatan de tayê malumatî ameyê dayîş. La nê xebatan ser o ne rexne ne zî şîroveyî ameyê kerdiş. Nê çî raştê-çewtê, dergê-kilmê belî nîyê. Yanî kamî çî nuşto cayê xwu de vinderteyo. Ne çewtîyâ înan ne zî raştîya înan nêvejîya ya meydan. Na xebate no ware de newîye hesebîyena. Hem hetê têvernayîşê xebatanê edatan ser o, hem zî derheqê na babete de çîyê elûzîyayeyî û kêmaneyî ser. Her çiqas kêmaneyî û xeletîya na xebate gelêk bo zî merdim eşkeno vajo derheqê edatan de na xebate, xebata yewin a. Înşela do feydeyê xwu bibo.

BEŞO YEWIN

1.XEBATANÊ ÇEND ZIWANNASAN DE EDATÎ

Mi gramerê Sebahattîn Gultekînî (Pasûr), Roşan Lezgînî (Licê), Deniz Gunduzî (Gimgim), Munzur Çemî (Dêrsim), Malmîsanijî (Pîran), Fahrî Pamûkçî (Çermûge), Harûn Tûrgût (Çewlîg) û Gruba Xebate ya Vateyî ser o xebate kerde. Edatêkê nê kitabê de ameyê nuştîş û tarîfkerdiş mi cîya bi cîya nîşan dayê. Çîyo ke mi rê muhîm yan zî balkêş ameyo mi nušto. Reyna, mîyanê nê xebatan de edatêkê yewbînê nêgêrenê, yanî seypê nîyê û yewbînan ra dûrî yê mi nuştê û farqê înan çîyo mi nîşan dayo. Reyna, goreyê nê xebatan ra çîyo ke hema zelal nêbîyo û eluzîyaye yo mi waşt ke binusyo. Nê xebatan de goreyê mintiqayan ra zaf farqê muhîmî estê û bi xwu asenê. Nê beşî de mi xebatê ziwannasan têhet de nuştî ke çiqas farqî estê wa bieysê. Bi no tewir wa hem çarçewayê edatan belî bibo û wa hem zî goreyê mintiqayan ra farqê edatan zelal bibo.

1.1 XEBATA SEBAHATTÎN GULTEKÎNÎ

Sebahattîn Gultekînî edatan ra vato “daçekîy”. Yanî Sebahattîn Gultekînî namekerdişê edatan de çekuya “**daçekîy**” xebitnaya. Edatê ke kitabê Sebahattîn Gultekînî de derbas benê tayê. Yanî Gultekînî, edatî zaf şenik girotê û nêkewto mîyanê xorînîyê înan. La Sebahattîn Gultekînî derheqê edatan de goreyê xebatkaranê ziwani yê bînan ra zaf çîyo cîya vato. Mesela vato, “**daçekêy xoserî/eslî û daçekêy nêxoserî**”. Dima behsê **tewênayîşê** edatan kerdo.

Edatêkê kitabê Gultekînî de yê wina ameyê nuştiş:

Edatê Xoserî/Eslî

“**bi (bê), di, de, ra, rê, ro, zî, dir**”

Gultekînî nê edatî kerdê di birrî.

Veredatî:

bi, di, bê, ro

Peyedatî:

ra, rê, de, dir/rejde, zî

Tîya de çîyo ke bala merdimî anceno katagorîya **bazinedatan** çinî ya.

Edatê Nêxoserî

/- **ra**/ pey ra, ver ra, bin ra, kişte ra,

/- **de**/ cor de, pey de, kişte de,

/- **ro**/ cêr ro, cor ro, pey ro, kişte ro,

Tewênayîşê Edatan

Sebahattîn Gultekînî tiya de nimûneyî nuştê. La seba ke binê kategorîzekerdişê edatan de mi nê nimuneyî nîşan dayê tiya de nê nusnena.

1. 2. XEBATA ROŞAN LEZGÎNÎ

Roşan Lezgînî, edatî bi teferûat îzeh kerdê û yew bi yew nimûneyî zî dayê. Hetta, cayo ke **edatî, bestoxî, prefiksî û suffiksî** benê tēmîyan ra, yew bi yew, cîya bi cîya mîsalî dayê û farqê înan nîşan dayo. Çimkî tayê çî, ma vajin sey edatanê “**bi, pê**” yî zereyê cumleyî de hem hetê nuştîşê de hem zî hetê manayî de benê tēmîyan ra. Roşan Lezgînî nê heme çî bi nimûneyan wa îzeh kerdê. Îzehkerdişê edatê **bi** û edatê **pê** yî de Roşan Lezgînî goreyê xebatkaranê ziwani yê bînan ra tayê çî yê ke cîya yê zî vatê.

Roşan Lezgînî peynî de, sernuşteyê “**Tayê Edatê Bînî**” akerdo û tîya de tena nameyê edatan (**gore, heta, hetanî, seba, semed, semedê, se, sey, seke**) nuştê. Îzehet û nimûneyê nê edatan çinî yê. Pêro edatî bi nimûneyanê xwu wa ameyê îzehkerdişî la tîya de çî ra îzehet û nimûneyî çinî yê nîno famkerdiş. Çimkî sereyê merdimî de persî virazîyenê. Însan vano, gelo nê edatî muhîm nîyê, çira mîyanê kategorîyan de nêameyê cakerdiş, çira nimûneyê înan çinî yê?

Kitabê Roşan Lezgînî de, derheqê babeta edatan de çîyo balkêşo bîn zî **partîkel** ê. Roşan Lezgînî, partîkelî beşêko xoser de nîşan dayê. La merdim baş fam nêkeno ke nê partîkelî, edatê yan nêy. Derheqê partîkelan de vato: “**Partîkelî zî eslê xo de yew çeşît edat ê, bi tena sereyê xo yew manaya xo çin a.**”¹⁰ Tarîfkerdiş ra aseno ke partîkelî zî eslê xwu de edat ê. Bi eslê xwu perso muhîm no yo: “Gelo kurdkî de partîkelî edat ê yan ney?” Gava ke ma edatan binusnê û bidî şinasnayîş, ma do partîkelan zî binusni yan ney? Partîkelî zî sey edatan manayê cumleye xurt kenê. Merdim eşkeno vajo, gava ke edatî zereyê cumleye ra vejîyenê manayê cumleye xeripîyeno la partîkelî vejîyê manayê cumleye zaf nêxeripîyeno.

Babeta partîkelan de, tena Roşan Lezgînî fikrê xwu vato û nuşto. Kitabanê xebatkaranê ziwani yê bînan de na babete çinî ya. Nê çekuyî zereyê cumleye de ganî bêre namekerdiş. Ma vajin, gava cumleyêk yena tehlîlkerdiş û heme çekuyî goreyê karê xwu ra yenê namekerdiş partîkelî bê name manenê. Yanî, zereyê cumleye de gerek nê çekuyî zî sey, **sifet, bestox, edat, partîkel**, yan zî sey çîyo ke bîn bêre

¹⁰ Lezgîn 2012, r.60.

namekerdiş. Yanî zereyê cumleye de ganî karêkê înan bibo û bi aweyêk bêre namekerdiş. Yan zî sey Roşan Lezgîni beşêko xoser de bi nameyê “partîkelî” bêre xebitnayîş. Loma na babete ganî siba roj bêro zelalkerdiş.

Edatê ke kitabê Roşan Lezgîni de derbas benê nêyê:

Veredatî:

bi, bê, pê, ro, ver bi

Peyedatî:

de, ra, rê, ro, ser o, wa; ya; a

Veredatî û Peyedatî Pîya:

di ... de; ede ... de

bi ... wa/ya/a

Partîkelî

Roşan Lezgîni partîkelî îzeh kerdê û nê partîkelê cêrîni zî zereyê cumleye de xebitnayê.

de, derey, dê, di, do, ha, hela, ka, la, wa

1. 3. XEBATA GRUBA XEBATE YA VATEYÎ

Grûba Xebate ya Vateyî edatî tarîf nêkerdê. Tena vato hîre çeşîde edatî estê û edatî çekuye ra cîya nusîyenê. Grûba Xebate, edatî zaf sade nîşan dayê û çarçewayê înan zaf kilm girota. Yanî zaf nêkewtê mîyanî xorinîya edatan la yew bi yew nimûneyî dayê û goreyê mintiqayan ra formê çekuyan nuştê û kancîn form tercîh kerdo nîşan dayo. Grûba Xebate ya Vateyî de nê edatî ameyê nuştîş:

Veredatî:

bi, bê, se-sey, pê, ver bi

Peyedatî:

rê, r', de, der, ser o, ra, ro, ya, a

Veredatî û Peyedatî Pîya:

bi ... ra

di ... de

ede ... de

a ... ra

beyntarê ... de

bi ... ya/bi ... a

bi ... bê/ebi ... bê

peyê ... ra

1. 4. XEBATA DENİZ GUNDUZÎ

Edatê ke kitabê Deniz Gunduzî de ameyê nuştîş û ê ke Gruba Xebate ya Vateyî de ameyê nuştîş eynî yê. Loma edatê ke kitabê Deniz Gunduzî de ravêrenê seba ke dibare/digark nêbo ez reyna nênusnena. La cayo ke Deniz Gunduzî nimûneyî dayê hîrê edatî bînî zî nuştê. Yanî nê edatî mîyanê kategorîya edatanê Deniz Gunduzî de çinî yê, tena cayê nimûneyan de ameyê nuştîş. Nê edatî: “**gore**”, “**seba**”, “**hetanî**” yê. Gelo nê edatî çira mîyanê birrê edatan de nêameyê cakerdiş, tena mîyanê nimûneyanê edatan de ameyê cakerdiş merdim nêzano.

1. 5. XEBATA MUNZUR ÇEMÎ

Munzur Çemî edatan ser o xebatêka hîra kerda û gelêk nimûneyî dayê. Hem fekê Dêrsim ra hem zî goreyê -bi vatişê Çemî- fekê cêr rî ra nimûneyî dayê. La nimûneyan de giranîya kirmanckîya Dêrsimî esta.

Çemî, edatî kerdê hîrê birrî la cayo ke edatî dayê şinasnayîş, hîrê birrê bînî zî ser o zêde kerdê û edatî kerdê şeş birrî. Kategorîya veredatan de tenî di edatî nuştê û manayê nê her di edatan zî nêzdîyê yewbînan o. Belkî na xebate de kêmaneyî ya tewr pîle na wa. Çimkî kirdkî veredatî zaf ê û muhîm ê. Veredatan ser o wina sade şiyayîş kêmaneyî ya. Nê edatî nê yê:

be.../ve...

Bawerîya mi be/ve to êna.

bi.../eve.../ebi.../ebe...

Şêx Seîd **bi** 300 merdimî şî Pîran.

Feqet kategorîya xebatkarane ziwani yê bînan de zî aseno ke **veredatî** zaf ê. Munzur Çemî tayê veredatî zî mîyanê kategorîyê ê bînan de nîşan dayê. Loma kategorîzekerdişê edatan de tayê çî bîyê têmîyan ra.

Mîyanê nê kategorîyan de birrêk esto; “**olumsuzluk edatları (edatê negatîfiye)**” zaf balkêş o. Çimkî hetê xebatkarane ziwani yê bînan ra na kategorîye sey edatan nêameya qebulkerdiş. Yanî wina kategorîyêk çinî ya. No çî ne sey **edatê negatîfi**, sey **prefiksê negatîfi** yeno qebulkerdiş. Mûnzûr Çemî, nê edatî yan zî nê prefiksî çekuyan ra cîya nênuştê, yanî çekuye wa dusyaye nuştê. Feqet goreyê tarîfkerdişê edatan ra ganî edatî çekuyan ra cîya binusyê. No, farqêko zaf pîl o û ganî bêro zelalkerdiş. Çimkî seba ke nê çî edat bêrê qebulkerdiş qaydeyêk, îzehetêk çinî yo. Munzur Çemî derheqê nê edatan de zereyê cumleye de wina nimûneyî dayê:

bê..., me..., nê..., nî..., ni...

... **bê** to ma...

... mewe,

... meke,

... meşo,

... nêkerd,

... rew nêame,

... ewro nîno ...

... qey nişona

Tena edatê **bê** yî çekuye ra cîya ameyo nuştiş ê bînî çekuye wa dusyaye/zeleqnaye ameyê nuştiş. Xwura ganî edatî çekuye ra cîya bêre nuştiş. Edatê ke kitabê Munzur Çemî de ameyê nuştiş nêyê:

1) Önedatlar (veredatî/prepozîsyonî)

be.../ve

bi.../eve.../ebi.../ebe

2) Artedatlar (peydatî/postpozîsyonî)

de, ...der, ...di, ...dir

ra, ...a, ...ya

rê

ro

ya

3) Önedatlar ile artedatlar birlikte (veredatî û peydatî pîya)

a...ra

bi/ve...ra

bi...ya/bi...a

di...de
beyntarê...de
mabênê...de
ede...de...bi/ve
ve...de
bi/ve...ra
ve...ro
peyê...ra

4) Olumsuzluk edatları (edatê negatîfîye)

bê..., me..., nê..., nî..., nî...

5) Yön bildiren edatlar (edatê ke hetî/îstîkametî nîşan danê)

de

ra

ro

6) Yer gösteren edatlar (edatê ke ca nîşan danê)

“**de**”

Çemî, no edat (**de**) kerdo di birrî:

a) Yalın hal (**halo xoser**)

ver **de**

pey **de**

cêr **de**

mabên **de**

b) Çekimli hal (**halo ante**)

corê ... **de**

binê **de**

hetê ... **de**

mabênê ...**de**

Munzur Çemî, derheqê nê edatî û her di halanê ey de gelêk nimûneyî dayê. Dima binê na kategorîye de yanî kategorîya “**edatê ke ca nîşan danê**” de nê edatî nuştê.

“ra”

ser **ra**

cor **ra**

mîyan **ra**

pey **ra**

peyê ... **ra**

cêrê ... **ra**

corê ... **ra**

“ro”

cêr **ro**

mîyan **ro**

naver **ro**

mîyanê ... **ro**

peyê ... **ro**

koyê ... **ro**

beynatey... de, beytarê... de

mîyanê... de, wertê... de, mabênê... de

beynatey... ra/beyntarê... ra

mabênê... ra

wertê... ra

beynatey... ro/beyntarê... ro

mîyanê...ro

wertê... ro

mîyanê/mabênê... ro

ede... de

seba..., seba ke...

pey ra...

pey ro...

bi... ra/ve... ra/be... ra

ser o/ro...

serê... der

binê... der

bin... de

lewe de

pey... der/pey de

zerreyê/zerrê... de/zerre de

ver... der

het... der

Kategorîyê **edatê ke ca nîşan danê** de nimûneyê “**seba..., seba ke...**” gelêk bala însanî ancenê. Mûnzûr Çemî nê edatî û nimûneyê înan wina nuştê:

Seba mi a kesêda rind a.

Ez honde raye **seba** to amane.

Seba ke ti meheredîyê, o qewaxane nêşî.

No **sebeb ra** ki barê ma zaf giran o, ganî zaf xoverbidîme.¹¹

Nê edatî “**seba..., seba ke...**” seba çi tîya de ameyo nuştiş nîno famkerdiş. Çimkî nê edatî ca nîşan nêdanê, sebeb nîşan danê. Nê edatî nînê famkerdiş. Beno ke bi xeletî tîya de ameyê nuştiş.

Seke cor zî aseno kategorîyê “**edatê ke ca nîşan danê**” ra lîsteyêka derge ameya meydan. Çemî, nê heme edatî zereyê cumleye de zî bikar ardê. Feqet kategorîkerdiş de edatî bîyê tîmîyan ra. Mesela Mûnzûr Çemî edatê “**de**”yî kerdo di birrî. “**Halo xoser û halo ante**”. La na kategorîye de edatê ke berdewam de ameyê nuştiş, tayê înan sey edatê **de**'yî, di halan de ameyê nuştiş, tayê înan zî normal ameyê nuştiş. Yanî nîno famkerdiş ke kamcîn edatî sey edatê **de**'yî wahirê di halan ê, kamcîn edatî sade yê. Ma vajin edatê **ra**'yî de yew nimûne wina ameyo nuştiş:

pey **ra** (halo sade)

peyê... **ra** (halo ante)

La dewamê na kategorîye de cayêk sey sernuşteyêk de edatê “**pey ra..**” zî esto.¹² No edat bi sereyê xwu yo. Yanî goreyê çarçewayê corînî ra, ne halo sade yo ne zî halo ante yo. Farqê ey û farqê halê sadeyî zî zelal nîyo. Tiya de kamcîn nimûne seba kamcîn kategorîye ameyo dayîş tam zelal nîyo. Kitabî de nêameyo nuştiş la çîyêko fam beno, sankî edatî rayêk goreyê cayê înan ra, rayêk zî goreyê rewşê înan ra kategorîze bîyê.

¹¹ Çem 2013, r.208.

¹² Çem 2013, r.208.

1. 6. XEBATA FEXRÎ PAMÛKÇÛYÎ

Xebatê Fexrî Pamûkçûyî, goreyê xebatkaranê zîwanî yê bînan ra zaf cîya ya. Hem kışta nuştişî ra hem kışta çekuyan ra zaf farqê estê. Fexrî Pamûkçûyî, alfabeyêko hetê Grûba Xebate ya Vateyî ra ameyo qebulkerdiş, di herfi cîya xebitnayê. Reyna, zîwan goreyê mintiqayê xwu ra xebitnayo. Xwura no çî zî mîyanê şarê kirdan de meseleyêka pîl a. Seba ke mîyanê şarê kirdan de perwerde çînî yo, goreyê mintiqayan ra zaf çî bedilîya yê. Herfî bedilîya yê. Cayê herfan bedilîya yo. Prefîksî û sufîksî bedilîya yê. Çekuyî deforme bîyê. Loma şar hêdî yewbînan ra fam nêkeno. Maalesef nê kitabî de zî nê çî estê. Gava ke goreyê mintiqayan ra cîya bi cîya gramer virazîyo a gavî zîwanêk de bi seyan gramerî vejîyenê meydan.

Edatê ke tîya de ameyê nuştiş zaf nînê famkerdiş û zaf çî zî standardê ewro ra dûrî yo. Xwura hetê raştnuştişî ra gelêk xeletiyê ey estê. Loma têvernayîş û nimûneyan de, edatanê nê kitabî zaf nêxebitnena. Seba ke zaf çî nêbo tîmîyan ra ez heta bieşkî nê kitabî ser o şenik vinderî û dima ravêrî.

F. Pamûkçûyî seba veredatan nimûneyo verên wina nuştî:

- **ê, ê dê. Payokên wayêrî**

“Na qolîk **ê** mîna.” Bu gömlek benimkidir.

“No zengen **ê dê** bîrar dê mîna o.” Bu kazma kardeşiminkidir.

Nê cumleyan de edat senîn virazîya yo, bi çî tewir bîyo edat, nêno famkerdiş. Verî her çî, **ê dê** aîdê mintiqayêke yo, mintiqayanê bînan de çînî yo. Gava ke no çî seba gramerî bêro nuştiş a gavî zaf problemî vejîyenê meydan. Reyna çekuyê “**bira**” yî bîya “**birar**” û “çekuyê “**dê**” yî zî na çekuye dima nuştî. Yanî, “... **ê dê** bîrar dê ...” telafûzkerdişê fekî yê mintiqayêke yo, gramer nîyo. Xwura cumleya verêne hem hetê gramerî ra hem hetê raştnuştişî ra xelet a. Reyna, nimûneyê veredatan ra yew zî wina nusya yo:

kışta ... a ... göre, ... a kalırsa

“**Kışta** mîna **a** tu çîçi kî wazenê bıkî.” Bana kalırsa ne istiyorsan onu yap.

Verê her çî, eger nê çekuyî edat bêrê qebulkerdişî ganî mîyanê bazineedatan de bêrê nuştiş. Çimkî mîyanê di edatan de çekuyêka bine esta. Loma nê çekuyî nêbenê veredat. Eger na cumleye sey mintiqaya Licê-Pasûrî bivajîyo, edatêko bîn virazîyeno. Mesela:

“Kışta min **ra**, ti çi wazenê bike”

Goreyê na cumleye ra qaîdeyî zî bedilîyayê. Cayê nê veredatî de (eger veredat o) pey edat yeno. Nê cumleyî hetê manayî ra nîzde yewbînî yê la hetê gramerî ra ser û bin benê. La îdîayê Fexrî Pamûkçuyî; no kitab seba pêro zazayan o.

Yew nimûneyê veredatan zî wina yo

... **rê (kî)**

“Mi **rê (kî)** o yo nêweş. Bana kalırsa/bence o hasta.”

Na cumleye de veredatêko senîn esto nîno famkerdiş. Eger (**kî**) bierzîyo edatê “**rê**” yî maneno û bi tenî sereyê xwu gramer de ca gêreno. Feqet a gavî zî no edat, grûba veredatan de nîyo, grûba peyedatan de yo. Tiya de **kî** çîyo nîno famkerdişî. Xwura manayê na cumleye, tewirêko tirkî ameya nuştiş, bin ra xelet a. Manayê na cumleye bi tirkî: “Bana hasta olan” o. La Pamûkçuyî vato: “Bana kalırsa/bence o hasta.” Loma, bi min goreyê fekê her mintiqaye ra gramerêko cîya nêvirazîyeno. La reyna zî, seba ke heta gramerêko raşt vejîyo meydan, her xebate muhîm a. Ganî ma verê raştîyanê xwu de xeletîyanê xwu zî bivîni ke gramerê ma raşt bibo.

Fexrî Pamûkçuyî zî edatî kerdê hîrê birrî û wina vato: “Zazaki dî, payoki hiri hallan dî benê; nê ya ver dê naman dî, yan pey dê cî dî, yan zî wurduna hallan dî yenê.” Seke aseno Pamûkçuyî, seba çekuya **edatî** çekuya **payokî** xebitnaya. Ferheng de manayê na çekuye nêameyo nuştiş la çekuyêka balkêşa û na çekuye tenî no kitab de esta. Edatê ke kitabê Fexrî Pamûkçuyî de ameyê nuştiş nê yê:

Veredatî

ê, ê dê

bê

qandê

heta, ta

hendê

kişta ... a

gore dê

... rê (kî)

vera

ze kî (zek)

Peyedati

a (ya)

dî (do-da-dê/deyo-deya-deyê

ra

a/ya

rê

ra

ro

Bazineedatî

bî ... a (ya)

ta ... ra

... da (maki)/dê (nêri) ... ra

... da (maki)/dê (nêri) ... a (ya)

1. 7. XEBATA HARÛN TÛRGÛTÎ

Xebata Harûn Tûrgûtî de vernî her çîyî, di çîyî bala merdimî ancenê. Nînan ra yew alfabe yo yew zî xebetnayîşê fekê Çewlîgî û fekê Xarpêtî yo. Alfabeyê Harûn Tûrgûtî, ne alfabeyê o yo ke kurdî bikaranê yo, ne zî o yo ke tirkî bikaranê yo. Yanî, tayê herfî goreyê alfabeyê tirkî yê, tayê herfî goreyê alfabeyê kurdî yê. Çend herfî zî ne ê alfabeyê tirkî yê ne zî ê kurdî yê. Harûn Tûrgûtî, seba ke qiseykerdişê fekê Çewlîgî bieşko rehet vejo/binusno nê çend herfê cîyayî zî xebetnayê. Harûn Tûrgûtî, seba xebetnayîşî fekê Çewlîgî û Xarpêtî zî vato, ez fekê nê mintiqayan xebitnena.

Xebata Harûn Tûrgûtî ke edatan ser o kerda, tede gelêk kêmanî estê. Edatî tam nîne famkerdiş. Mesela îzehkerdişê edatan de îfadeyêko wina vato, “edatî û çekuyê ke sey edatan yenê xebitnayîşî” Çekuyê ke sey edatan yenê xebitnayîşî çîyê, karê înan çîyo, çî ra sey edatan yenê xebitnayîşî îzeh nêkerdê, çîyêk nêvato. Mîyanê nimûneyan de sernuştikêk de vato, “**ad durum ekleri**” (qertafê halê nameyî) û dima nimûneyî rêz kerdê. La çîyo winayîn heta nika hetê xebatkarane ziwani yê bînan ra nêameyo vatiş. Loma seke mi cor zî vat, Harûn Tûrgûtî, çîyo ke derheqê edatan de vato zaf nîno famkerdişî. Xwura hetê raştnuştîşî ra gelêk xeletîyê ey estê. Gramerê ey standardîzasyonê ewro ra dûrî yo. Loma ez mîyanê xebata xwu de, seba têvernayîşî û nimûneyan nê kitabî zaf nêxebitnena.

Îdîayêkê Harûn Tûrgûtî, seba pêro kirdan û çapkerdişê kitabêkê bê qusurî çinî ya. Xwura ey bi xwu vato; ez ziwane kirdan ser o xebitîyaya û ez wazena xebata xwu bi kêmanîya xwu wa sey destpêkêk vejî meydan.

Kitabê Harûn Tûrgûtî sey fermî cayêk ra nêameyo çapkerdiş, aweyo ke yeno famkerdiş, xebata xwu cayêk de sey kopya çap kerda. Harûn Tûrgûtî, edatê ke nuştê, nimûneyê înan zî zereyê cumleye de nîşan dayê. Ez do na xebate nîşan bidî la nimûneyan ra yew nimûne binusnî.

Harûn Tûrgûtî, edatî û nimûneyê înan wina rêz kerdê:

bye, bê

Yi bye perê yi. (Onlar parasızdır.)

Hiend

Hiendey yew vıncı cay yi çiniyu.

sê

guere

têna

vera

pa ... a

pê ... a

tor ... a

hêt ... a

qê ... a

semed ... a

eni ... a

derheq ... dı

hetat ... dı

herın ... dı

het ... dı

eni ... a

mıyun ... dı

sêr ... o

hetat ... ra

rıdı ... ra

hêt ... ser

Ad durum ekleri (qertafê halê nameyî)

-a

-dı

-o

-ra

-rı

-ri

-ra cyer

-ra cuar

-ra nat

-ra wet

-ra pey

-ra ver

-ra hıeta

1. 8. XEBATA M. MALMÎSANIJÎ

Malmîsanijî edatî zaf hîra nuştê. Mîyanê kirdan de kancîn mintiqayan de bi çî tewir edatî estê heme nuştê. Yanî hem goreyê mintiqayan ra formê mîyanê çekuye (**heta/hetan/hetani/hetana/hetanê/heto/hetona/hetonî/hetû/hetûn/hetûna/hetûnî/h**

ata/hatan/haton/hêtûna) hem zî varyantê çekuyêkê eynî mana de yê (**qandê, seba, semedê/sey, fenê, zê**) nuştê. Cografyayê kirdan de goreyê mintiqayan ra fekê lokalî zaf ê. M. Malmîsanijî nê pêro fekî nuştê. Reyna, tabloyan de tayê çî bi xeletî ameyê nuştiş û nê çî zî hetê famkerdişî wa tabloyan kenê giran. Tayê çî zî nîno famkerdiş. Nê çîyê ke nîne famkerdiş seke mi va beno ke zaf lokal mendê. Ziwanê erebkî ra zaf edatî ameyê kewtê mîyanê ziwane kurdkî. Xwura tabloyê M. Malmîsanijî de zî nê çekuyî asenê. Nê çî seba standardîzasyonê gramerî zî zehmetî vejenê. Seba ziwane nuşteki û seba perwerdeyî zî astengîye virazenê. Şarê kirdan, qisêkerdiş de û yewbînan ra famkerdiş de xwura mîyanê xwu de zehmetî anceno. Seba standardîzasyonê ziwani, bi min, miheqeq nê edatan ser o xebatêka hîra bêro kerdiş û çarçewayê edatan bêro tengkerdiş. Cayê edatanê erebkî de, ganî edatê kirdkî bêre tercîhkerdiş. Yanî sey xebata gruba vateyî mîyanê varyantan û formanê çekuyan de tercîh bêro kerdiş. Xebata M. Malmîsanijî ra eyseno ke dewanê kirdan ra bigêrê heta şaristananê înan, cîya bi cîya fekî estê, cîya bi cîya varyant û formê çekuyan estê. Nê heme çîyan zî tesîrê edatan kerdo.

Xebata M. Malmîsanijî zereyê tablo de ameye amadekerdiş û zaf hîra ya. Seba ke tabloya M. Malmîsanijî de form û varyantê çekuyan zaf ê ez do formê çekuyan ra o yo verîn binusnî. Mesela edatê **heta/hetan/hetanî/hetana/hetanê/heto/hetona/hetonî/hetû/hetûn/hetûna/hetûnî/hata/hatan/haton/hêtûna** ra ez do formo verîn “**heta**” yî binusnî. Reyna M. Malmîsanijî tayê edatî nuştê û dima seba îzehetî vato biewnê falan nimûneyî ra. Çimkî formo ke zafane yeno zanayîş xwura îzeh kerdo. Mesela:

di ... di: bak. **di ... de** (“bak.” kirdkîya ey “biewnê”)

ede ... de: bak. **di ... de**

edi ... de: bak. **di ... de**

Tîya de formê bazineedatê “**di ... de**” yî ameyo nîşandayîş. Seba ke xebata mi zî zaf nêbo tîmîyan ra, formê ke referans ameyê nîşandayîş ez do înan binusnî û ê bînan nênusnî.

M. Malmîsanijî xebata xwu de zazakî, kurmanckî û tirkî dayê têver. Na xebate

seba têvernayîşê zazakî û kurmanckî zî zaf muhîm a. Têvernayîş de, însan hem çîyo muşterek hem zî çîyo cîya yê her di lehçeyan vînenê. Reyna, nimûneyê ke nînê famkerdişî merdim eşkeno biewno dîyalekto bîn ra. Edatê ke kitabê M. Malmîsanijî de ameyê nuştiş nê yê:

Veredatî (Önedatlar)

a

bê

bi-I

bi-II

de

di

era

fenê

hewayê

hende

heta

heya

pê/bi

qandê

ra

rê

ro

seba

semedê

seke

sey

tewlî

ver bi

vera

verê

xêncê

Peyedatî (Artedatlar)

de

mîyan

r'

ra

reyde

reyra

rê

ro

ya

Veredatî û Peyedatî Pîya (Önedat ve Ardedat Birlikte)

a ... ra

beyntarê ... de

bi ... bê

bi ... ra

bi ... wa

di ... de

herinda ... de

hetê ... ra

mabênê ... de

pa ... wa

pey ... de

peyê ... ra

pê ... a

qandê ... rê

semedê ... ra

Xebata M. Malmîsanijî ra tayê nimûneyan ez do sey orjînalê înan nîşan bidî. Yanî seba her sernuşteyî (veredatan-peyedatan-bazineedatan) rê tabloyan ra rîpelêk nîşan bidî. Ma vaj, seba **veredatan** rîpelêk, seba **peyedatan** rîpelik û seba **bazineedatan** zî rîpelêk nîşan bidî. Çimkî ez wazena M. Malmîsanijî derheqê edatan de xebata xwu senî amade kerda, gorêyê mintiqayan ra seni nimûneyî dayê, form û varyantê çekuyan senî nuştê wa bêrê zanayîş. Tabloyê M. Malmîsanijî seba xebata mi gelêk nimûneyan nîşan dana, çîyê ke ez wazena vajî bi teferût tede estê. Mîyanê mintiqayan de çiqas farqî estê û nê çî seba standardîzasyonî çiqas çîyo eluzîyaye virazenê bi zelalî nîşan danê.

Tablo 1: Tabloya M. Malmîsanijî Veredatî

Kırmancca (Zazaca)	Kurmancca	Türkçe
a “Bidi a min.” “ Qirin cle kewno a dest.”	bi Bide bi min. Beq bi dest dikeve.	-e Bana ver. Kurbağa eline/ele geçer.
bahdê	piştî	-den sonra
be: bak. bi		
bê/bîye Bê werd kar nêkeno. Zelale bê dadîya xo nêşiyêne cayekî.	bê/bêyî Bê xwarin kar nake. Zelalê bê /bêyî dîya xwe nedîçû cîyekî.	-sız Yemeksiz iş yapmaz. Zelale annesi olmaksızın {hiç} bir yere gitmezdi.
bi-I/be/ebi/ebe/hebe/ve/eve/vi Bi qelema xo îmza kerd. “ Bi /ve Zulfîqarê disereyî, ti ey rê bîyîeyan.” “ Eve dest loqme ve loqme wenê.”	Bi/be (GK)/we Bi qelema xwe îmze kir. “ We Zulfîqarî duser, tu le wî bûy eyan.” “ Bi dest loqme bi loqme dixwin.”	ile, vasıtasıyla Kalemîyle imzaladı. “İki uçlu Zilfîkar ile ona aşîkar oldun.” “Elle lokma lokma yerler.”
bi-II/ be/ebi/ebe/hebe/ve/eve/vi Bi des camêrdan rayir kewt.	bi Bi deh camêran bi rê kevt/ket.	ile, birlikte On erkekle yola düştü.

Tablo 2: Tabloya M. Malmîsanijî Peyedatî

Kırmancca (Zazaca)	Kurmancca	Türkçe
a: bak. wa		
a: bak. ra	li/le	-den
a: bak. ra Ser a vindeto/vinderto. “Tamurê mi ser a têla min a Deftere de pela min a” (Xidirê Başî)	li/le Li ser sekinîye. “Li ser tembûra min têla min e Di defterê de pelê min e” (Xidirê Başî)	-de Üzerinde durmuş. “Tamburumun üzerinde telimdir Defterde yaprağımdır.” (Xidirê Başî)
de/di/der/dir/id Kam sinife de mend? Welat de çi esto, çi çin o?	de/da Kî {di} sinifê de ma? Li welêt çi heye, çi tun e?	-de Kim sınıfta kaldı? Ülkede ne var, ne yok?
der: bak. de		
di: bak. de	de/da	
dir: bak. de	de/da	
id: bak. de	de/da	
mîyan Ê şî dewijan mîyan.	nav Ew çûn nav gundîyan.	içine, arasına Onlar köylülerin arasına gittiler/katıldılar.
o: bak. ro To banî ser {r} o çi dî?	Te li ser xanî/banî çi dît/dî?	Damda (damın üzerinde) ne gördün?
r' Dime r' a.	li Li dûv e./Li dû ye.	
ra Ti mi ra vanî?	ra/ji ... ra Tu min ra dibêjî?/Tu ji min ra dibêjî?	-e Bana mı diyorsun?

Tablo 3: Tabloya M. Malmîsanijî Veredatî û Peyedatî Pîya

Kırmancca (Zazaca)	Kurmancca	Türkçe
a ... ra Lajek/layik kincanê xo dano a xo ra.	li Lawik kincên xwe li xwe dike.	-e Oğlan giysilerini giyiyor.
be ... a: bak. bi ... wa		
beynatey ... di: bak. beyntarê ... de		
beynateyê ... di: bak. beyntarê ... de		
beyntardê ... di: bak. beyntarê ... de		
beyntarê ... de/beyntarê ... di/ beyntardê ... di/ beynateyê ... di/ beynatey ... di Beyntarê/beynateyê Şaribane û Sosine de çi esto?	di navbeyna ... de/di beyna ... de Di navbeyna Şarîbanê û Sosinê de çi heye?	arasında Şaribane ile Sosin'in arasında ne var?
beyntarê ... di bak. beyntarê ... de		
bi ... a: bak. bi ... wa Ti zî bi min a bê.	bi ... va/bi ... ve Tu jî bi min va/ra bê/were. Tu jî bi min ra bê/were.	ile, birlikte, beraber Sen de benimle gel.
bi ... bê/ebi ... bê Keje bi destê bê xo nuştö.	bi Kejê bi destê xwe nivîsiye.	ile Keje kendi eliyle yazmış.
bi ... ra/ebi ... ra/ebe ... ra/eve ... ra/ve ... ra/pey ... a Ez bi Zerrîweşî ra ameya.	bi ... ra/bi ... re Ez bi Zerrîweşî ra hatim.	ile, birlikte, beraber Zerriweş ile {birlikte} geldim.
bi ... wa/ bi ... ya/ bi ... a/ be ... a/ û ... a/ û ... ya/pey ... ya "Mewlidê Kirdî bi CD wa newe ra çap bi."	bi ... va/ bi ... ve Mewlidê Kirdî bi CD va ji nû va çap bû.	ile, birlikte, beraber Kürtçe (Zazaca) Mevlit CD ile yeniden basıldı.
bi ... ya: bak. bi ... wa Polat bi yew mêrdekî/mêrikekî ya ameyo.	bi ... va/ bi ... ve Polat bi yek mêrikekî (yek mêrikî) va/ra hatîye.	ile, birlikte, beraber Polat bir adamla gelmiş.

BEŞO DIYÎN

2. ZAZAKÎ DE KATEGORÎZEKERDIŞÊ EDATAN

Xebatkarê zîwanî ê yê ke edatan ser o xebitîyayê cîya bi cîya çî nuştê. Hetê kategorîzekerdişî ra zî farqê muhîmî estê. Kategorîzekerdiş de xebata Roşan Lezgînî, Denîz Gunduzî, M. Malmîsanijî, Fexrî Pamûkçûyî û Grûba Xebate ya Vateyî zaf nîzdê yewbînan a. Bi taybetî xebata Sebahattîn Gultekînî û Munzur Çemî hetê kategorîzekerdiş ra goreyê ê bînan ra zaf cîya ya. Harûn Tûrgûtî zî edatî kategorîze nêkerdê la reyna zî edatî sey di grûban cîya kerdê û vato; *edatî û çekuyê ke sey edatan yenê xebitnayîşî*.

Seba ke mi cor zî xebata heme xebatkarên zîwanî yew bi yew nuşta ez o tîya de tena katekorîya edatan bi kilmî nîşan bidî. La seba ke xebatan de muşterekî çînî ya ez o nê xebatan sey hîrê kategorîyan nîşan bidî.

2.1. KATAGORÎYA ROŞAN LEZGÎNÎ, YÊ DENÎZ GUNDUZÎ, YÊ M. MALMÎSANIJÎ, YÊ FEXRÎ PAMÛKÇÛYÎ Û YÊ GRÛBA XEBATE YA VATEYÎ

Xebata Roşan Lezgînî, Denîz Gunduzî, M. Malmîsanijî, Fexrî Pamûkçûyî û Grûba Xebate ya Vateyî zaf nîzdê yewbînan a. Na grûbe edatî kerdê hîrê birrî. Feqet Fexrî Pamûkçûyî namekerdiş de çîyo cîya vato. Nê xebatkarên zîwanî pêrine vato; *veredatî, peydatî, veredatî û peydatî pîya*. Pamûkçûyî vato; *payokên verhallan*,

payokên peyhallan û payokên hurg dudu hallan.

Kategorîzekerdişê na grûbe wina yo:

a) Veredatî

b) Peyedatî

c) Veredatî û peyedatî pîya

2.2. KATAGORÎYA SEBAHATTÎN GULTEKÎNÎ

Sebahattîn Gultekînî edatî kerdê di birrî:

a) Edatê Xoserî

Veredatî

Peyedatî

b) Edatê Nêxoserî

Sey aseno ke kategorîya **Gultekînî** de yê ê bînan ra cîya “**veredatî û peyedatî pîya/bazineedatî**” çinî yê. La **Gultekînî** katagorîyêka bîne viraşta. Reyna, xebatkarane ziwani yê bînan kategorîzekerdiş de edatî kerdê hîrê birrî (veredatî, peyedatî û bazineedatî) la Gultekînî hem nameyê kategorîyan cîya nuşto hem zî zereyê kategorîyan de cîya bi cîya çî nuştê.

Gultekînî, sernuşteyê “Edatê **xoserî** û edatê **nêxoserî**” de wina vato: “Daçekîy bi goreyê virazîyayîş û gureyê xo benê di birrîy.”¹³ Edatanê **xoserî** ra vato edatê **eslî**. Edatanê **nêxoserî** ra zî vato; seba ke yew edat û yew çekuye pîya yenê vatiş bîyê edatê **nêxoserî**. Gultekînî edatê **nêxoserî** wina tarîf kerdê: “Daçek û çekuyêke ra pêk yenê. Ca û vercaiyî nişan danê.” Nînan ra hîrê (**-ra, -de, -ro**) edatî nişan dayê û gelêk

¹³ Gultekîn 2010, r.75.

nimûneyî nuştê.

“Embazîy na **bin ra** viyartîy şîy.”

“Ver de fina to, **pey de** fina ey vano.”

“Gureyê xo leze bikerê **cor ra** varite yena.”

Reyna **Gultekînî**, ê binan ra cîya bahse **tewênayîşê edatan** kerdo. Tewênayîşê edatan de nê nimûneyî dayê û îzehetê înan zî kerdo.

“Zinarî Kendal vîna.”

“Zinarî Kendalî ra vat.”¹⁴

Goreyê Gultekînî ra, na cumleya dîyîne de, seba ke edat ameyo xebitnayîş çekuya Kendalî herfa “î” girota û ameya tewênayîş.

2.3. KATAGORÎYA MUNZUR ÇEMÎ

Kategorîzekerdişê Munzur Çemî de zî goreyê ê bînan ra farqî zaf ê. Sere de Munzur Çemî zî edatî kerdê hîrê birrî la berdewam de cayo ke edatî îzeh kerdê hîrê kategorîyê bînî zî ro înan zêde kerdê û edatî kerdê şeş birrî. Kategorîya Çemî winaya:

- 1) Önedatlar (veredatî/prepozîsyonî)
- 2) Artedatlar (peyedatî/postpozîsyonî)
- 3) Önedatlar ile artedatlar birlikte (veredatî û peyedatî pîya)
- 4) Olumsuzluk edatları (edatê negatîfîye)
- 5) Yön bildiren edatlar (edatê ke hetî/îstîkametî nîşan danê)
- 6) Yer gösteren edatlar (edatê ke ca nîşan danê)

Edatê ke Munzur Çemî sernuşteyê pancine de nîşan dayê (edatê ke îstîkametî nîşan danê/-de, -re, -ro), Gultekînî sey katagorîya “**edatê nêxoserî**” nîşan dayê.

¹⁴ Gultekîn 2010, r.78.

BEŞO HÎRÊYIN

3. GOREYÊ MINTIQAYAN RA VURNAYÎŞÊ EDATAN

Zazakî de, edatî zî sey zaf çîyan sereraşt nêbîyê û eluzîyaye yê. Xebatkarê ziwani yê ke edatan ser o xebitîyayê, seke mi cor zî vat hema edatan ser o çîyo ke muşterek nêvirašto. Hema kêmaneyî zaf a. Seba ke lehçeya kirdkî de nuştiş vila nêbîyo û perwerde nêameyo kerdiş zafê çî lokal mendo. Goreyê mintiqayan ra zî hema gelêk çîyî yewbînan ra dûrî yê. Mesela edatê ke tayê mintiqayan de estê, eynî edatî mintiqayanê bînan de çinî yê. Mintiqayêka bîne de bibê mintiqayêka bîne de çinî yê. Na rey gava ke tayê edatî goreyê mintiqayêk ra yenê xebitnayîş famkerdişê înan beno zehmet. Hetta seba ke zereyê cumleye de tesîrê edatan zaf o tayê cumleyî qet nînê famkerdişî. Tayê edatî zî bi mana xwu eynî yê la goreyê mintiqayan ra nuştişê înan cîya yo. Loma gava ke edatî bedilîyenê, mîyanê kirdan de yewbînan ra famkerdiş zî beno zehmet. A yewe ra seba têvernayîşî ez wazena tayê nimûneyan bidî û nimûneyan zî zafane Grûba Xebate ya Vateyî ra bidî. Dima nê nimûneyan goreyê mintiqaya Licê û Pasûrî ra bidî têver. Seba ke bi desan nimûneyî estê ez o çend nimûneyanê balkêşan weçînî.

1. Tayê edatî tayê mintiqayan de estê tayê mintiqayan de çinî yê. Yanî zereyê cumleye ra edat vejîyo zî manayê cumleye goreyê mintiqaya bîne ra nêvuryena. Hetta goreyê mintiqaya bîne ra seba ke manayê cumleye tam bêro famkerdiş ganî edat cumleye ra bêro vetiş.

- bi ... bê, - ebi bê

“Kêneke **bi** fek **bê** xo vato/ Keyneki **ebi** fek **bê** xwi vato.”¹⁵

Eger ma na cumleye bi fekê Licê û Pasûrî vajin;

“Kêneke **bi** fekê xwu vato.”

Tîya de “**bê**” bêmana yo. Yanî, edatê“**bê**”yî ganî cumleye ra bêro vetiş. Edatê “**bi**” yî zî cumleya diyîne de herfa “**e**” yî girota û bîyo **ebi** û ebi hetê Licê û Pasûrî de nîno famkerdiş.

- **bi ... ra, dir**

“Aşme **bi** tîjî **ra** vejînê, cok a aşme nêasena ...”¹⁶

Na cumleye mintiqaya Licê û Pasûrî de wina yena vatiş: “Aşme Rojî **dir** vejîyena.” Yanî edatê **bi ... ra** şino cayê ey de edatê **dirî** yeno.

- **ede .. de**

“Xidê Momid, **ede** raya trêna Erzingan **de...**”¹⁷

Tîya de “**ede**” mintiqaya Licê û Pasûrî de manayê xwu çinî yo û nênusîyeno zî. Feqet seba ke cayê veredatê “**di**”yî de yeno xebitnayîş ganî gramer de nê mintiqayan de veredatê “**di**”yî bêro xebitnayîşî.

- **a**

“Lajekî lewê kênek **a** day. (Oğlan kızı öptü.)”¹⁸

Na cumle hetê mintiqaya Licê û Pasûrî de qet nîna famkerdiş. Na cumleye, eger ma sey mintiqayê Licê û Pasûrî vajin, a gavî cumleye de edatê “**a**” vindî beno. Yanî:

“Lajekî lew na kêneke wa yan zî lajekî kêneke miç kerde.”

¹⁵ Deniz Gündüz (Edîtor), **Rastnuştîşê Kirmanckî (Zazakî)**, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul 2012, r.84.

¹⁶ Çem 2013, r.209.

¹⁷ Mûnzûr Çem, Hotay Serra Usifê Qurzkizî ra: Deniz Gündüz (Edîtor) 2012, r.83.

¹⁸ Gündüz (Edîtor) 2012, r.83.

- **ya**

“Ez semedê şima **ya** ameya.”¹⁹

Mintiqaya Licê û Pasûrî de no edat zî (**ya**) nîno xebitnayîş. Yanî ganî cumleye ra bêro eştiş. Ganî cumleye wina bo;

Ez semedê şima ameya.

2. Tayê edatî goreyê mintiqayan ra deforme benê. Yanî çekuyê edatî ra tayê herfî yan kewenê yan zêdîyenê yan zî bedilîyenê.

- **der**

“Kêneke mekteb **der** a.”²⁰

Eger na cumle sey Licê û Pasûrî bêro vatiş: “Kêneke mektebe **de** ya.” Yanî edatê “**der**”î beno edatê “**de**”yî, yanî herfa “**r**” yî kewena. Yan zî;

“Keyneki **bi** fek bê xwi vato.”

“Keyneki **ebi** fek bê xwi vato.”

Cumleya yewîne de edat “**bi**” yo, cumleya diyîne de “**ebi**” yo. Yanî ya cumleya yewîne de herfa “**e**” yî kemî ya yan zî cumleya diyîne de herfa “**e**” yî zêde ya. Eger sey mintiqaya Licê û Pasûrî bêro vatiş ganî herfa “**e**” yî bêro eştiş.

r,

“Ez tîya **r** a.”²¹ Mintiqaya Licê û Pasûrî de: “Ez tîya **de** ya.” Yanî edatê “**r**” beno edatê “**de**”yî.

3. Goreyê mintiqayan ra, eynî cumleye de û bi eynî mana de edatê cîyayî estê. Tayê edatî eynî kok ra yenê la formê înan (qandê/qaydê/qabê/qey/qeybê/qêwê) cîya

¹⁹ Gündüz (Edîtor) 2012, r.83.

²⁰ Gündüz (Edîtor) 2012, r.82.

²¹ Gündüz 2013, r.156.

yê. Ez formê ke eynî kokî ra yenê nêusnena. Çimkî goreyê mintiqayan ra hema-hema formê heme edatan estê û tayê înan wahire desan nimûneyanê. La tayê edatî zî eynî mana de yê la çekuyê înan (dir/rejde/ya/de) cîya yê.

- **dir** - **reyde** - **ya** - **de**

Mi **dir** bê Dîyarbekir.

Mi **reyde** bê Dîyarbekir.

Mi **ya** bê Dîyarbekir.

Mi **de** bê Dîyarbekir.

Nê her çar cumleyan de zî edat bi eynî mana ameyo xebitnayîş feqet hetê şekilî ra eleqeyê çekuyan bi yewbînan wa çinî yo. Yanî nê edatî varyantê cîya bi cîya yê. Reyna;

- **seba...** - **semed...** - **qandê**

Ez **seba** to şîya Dîyarbekir.

Ez **semedê** to şîya Dîyarbekir.

Ez **qandê** to şîya Dîyarbekir.

- **gore...** - **bi...** - **qasê**

Tîya de edatê **gore**'yî balkêş o. Denîz Gunduzî mîyanê yew cumleye de no tewir nîşan dayo:

“**Goreyê** to kam rind o? Sana **göre**/sence kim güzeldir?”²²

Tiya de edatê **goreyê** veredat o la gava ke merdim cewabê na cumleye dano edatê **goreyê** beno peydat.

Mi **gore** ti rind a.

²² Gündüz 2013, r.34.

Hetê Licê de cayê edatê **goreyî** de edatê **bi** yî zî yeno xebitnayîş:

“**Goreyê** to kam rind o?” (Mi gore ti rind a.)

“**Bi** to kam rind o?” (Bi min ti rind a.)

Yanî cayê edatê **gore**'yî de merdîm eşkeno veredatê **bi**'yî zî bikar bîyaro. Feqet edatê **goreyî** manayêka bîne de zî yeno xebitnayîş:

“Mi **goreyê** linganê xwu ra pûncî nêdî.”

“Mi rê **goreyê** bincewêk/vincewêk ra lak lazim o.”

Nê nimûneyan de manayê edatê **goreyî** cîya yo. Tiya de merdim nêşkeno cayê edatê **goreyî** de edatê **bi** yî bixebitno. Feqet cayê nê nimûneyan de edatê “**qasê**” yî zî yeno xebitnayîşî.

“Mi **qasê** linganê xwu ra pûncî nêdî.”

“Mi rê **qasê** bincewêk/vincewêk ra lak lazim o.”

“Ti **qasê** mi zazakî nêzanê.”

- **eve/ve - bi**

Gayo birîndar, **eve/ve** dej û qorayîş tir **ro** şî cêr.²³

Edatê **eve/ve** yî mintiqaya Licê û Pasûrî de beno **bi**. Yanî edatê **eve/ve** yî mintiqaya Licê û Pasûrî de hem vuryeno hem zî bi tewirê **eve/ve** yî nîno famkerdişî. Na cumleye wina yena vatiş:

Gayo birîndar, **bi** dej û qorayîş çir **ro** şî cêr.

Sey nê nimûneyan bi desan nimûneyî estê. Xwura merdim tena biewno xebata M. Malmisanişî ra do na babete bêro famkerdiş. La seba ke nê çî mîyanê pêro kirdan

²³ Çem 2013, r.201.

de bêre famkerdişî ganî dezgehê perwerdeyî bibo. Gava ke dezgehên perwerdeyî awan bibê zîwan bi xwu standardîze beno. Çimkî çiqas xebatê zîwanî bêre kerdiş zîwan ende standardîze beno û raver şino. Xwura xebatêkê heta nika ameyê kerdiş delîl ê nê çî yê.

BEŞO ÇARIN

4. DERHEQÊ EDATAN DE TAYÊ ÇÎYÊ ELUZÎYAYEYÎ

Seba ke zazakî de sey fermî perwerde çinî yo tayê çî hema baş zelal nêbîyê. Edatan de zî heman çîyê eluzîyayeyî estê. Kitabê ke ez înan ser o xebitîyawa, înan de zî eynî çî esto. Derheqê tayê çekuyan de cîya bi cîya fikrî estê. Hetta derheqê eynî çekuye de zitê yewbînan fikrî estê. Gava nê çekuyî tespît bibê û înan ser o şîrove bêro kerdiş go nê çekuyî hina baş zelal bibê. La seke mi cor zî vat, ganî bingeh de mîyanê şarî de perwerde bibo. Tayê çîyê ke mi tespît kerdê, mi ê çî nuştî. Tîya de ez, ne ku wazena kêmaneyî bivînî, waştîşê mi o yo ke, belkî tayê çî hina baş zelal bibê.

4.1. XELETNUŞTIŞÊ ÇEKUYANÊ “CÎRA (CÎ RA), TERA (TE RA) Û XWURA (XWU RA)” YÎ

Tayê çekuyî xelet yene nuştîş. Mesela zemirî kesî “**ci**” û peydat “**ra**” yî .yenê têver û sey yew çekuye “**cira**” yenê nuştîş. La a raştî, gani di çekuyê cîyayî, sey “**ci ra**” bêrê nuştîş. Çekuyên “**te ra**” (tera) zi eynî bi no qeyde yê. Sey yeno zanayîş zî zazakî de edatî çekuyan ra cîya nusyenê. Loma nê çekuyî ganî wina bêrê nuştîş: **te ra**, **ci ra**. Çimkî **te**, **ci** zemîrê kesî yê. Feqet tayê cayan de nê çekuyî xelet yenê nuştîş. Nimûneyî:

... qey ma **cira** handayê hîmet û ...

... qerar da ke **cira** vajo.²⁴

Heş mirya **tira** (**cira**) keno û şewqî aşm ver ra ûnîyeno mirya ra.²⁵

... mayîn **tira** gênî.²⁶

... tira vato, ...²⁷

“Pêro pîya şî yew **tera** nêbî kemî,

Labelê hafiz bî Rebbê ‘alemî.”²⁸

“Da cewab nûrî ver a Rebbê wera,

“We ‘eleykumus-selamu” va **tera**.²⁹

Bi zarêka hîna weş **tira** vat.³⁰

Reyna nuştîşê çekuyê “**xwu/xo ra** û **xwura/xora**” de zî ge-ge xeletî virazîyenê. Eger çekuye cayê nameyî bigêro yanî zemîr bo, **ra** beno edat û ganî cîya binusyoye. Eger çekuye manayê **zaten** bido, **ra** sufîks a û çekuyewa dûsyaye nusyena. Nimûneyî:

Ferzende zaf tembel o, **xwu ra** nêvînenoye firêk awe bişimo.

To nêvateyê zî ez a **xwura** bidî.

4.2. TÊKILÎYA EDATÊ “BÎ”YÎ Û EDATÊ “PÊ”YÎ

Xebatêkê derheqê edatan de ameyê kerdiş, nê xebatan de zî veredatê “**bi**” û veredatê “**pê**” yî baş zelal nêbîyê. Yanî nê her di edatî hetê manayî ra kewenê têmîyan.

²⁴ Îlhamî Sertkaya, **Sosine û Gulzare**, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul 2013, r.12-13.

²⁵ Deniz Gündüz (Editor), **Nika Wextê Huyayîşî yo**, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul 2008, r. 21.

²⁶ Seyîdxan Kuriş, “Tarîxê Ma ra Çend Portreyî”, **Kovara Nûbiharî**, Hûmare 118, Cild 15, İstanbul 2012, r.22.

²⁷ Kuriş, “Tarîxê Ma ra Çend Portreyî”, **Kovara Nûbiharî**, r.23.

²⁸ Ehmedê Xasî, **Mewlidê Kirdî**, Roşan Lezgîn (Amamekar û Tadayîş), Weşanxaneyê Nûbiharî, İstanbul 2013, r.33.

²⁹ Ehmedê Xasî 2013, r.28.

³⁰ Mehmed Nêşite, **Çaketo Sipî**, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul 2012, r.15.

Zafê cayan de merdim nêzano ke edatê **bi**'yî bikar bîyaro yan edatê **pê**'yî. Kitabêkê ez ser o xebitîyaya înan de zî nê edatî cayê yewbînan de ameyê xebitnayîş. Çimkî tayê cumleyî estê merdim kamcîn edatî bikar bîyaro, ro ci yeno. Feqet tayê cumleyî zî estê merdim nêşkeno nê edatan cayê yewbînan de bikar bîyaro. Yan zî ma vajin, zafê cayan de merdim eşkeno cayê edatê **pê**'yî de edatê **bi**'yî bikar bîyaro. Mesela kategorîya Munzur Çemî de edatê **pê**'yî çinî yo. No edat, zereyê kategorîyê edatê **bi**'yî de ameyo qebul kerdiş. Munzur Çemî, gava ke edatê **bi**'yî dayo şinasnayîş û nimûneyî dayê, mîyanê nimûneyan de edatê **pê**'yî zî xebitnayo. Xebata Sebahattîn Gultekînî de zî edatê **pê**'yî çinî yo. Yanî Sebahattîn Gultekînî cayê edatê **pê**'yî de edatê **bi**'yî xebitnayo. M. Malmîsaniyî gava ke edatê **pê**'yî dayo şinasnayîş varyantê “**pey**” û “**bi**”yî zî (**pê/pey/bi**) nuştê. Yanî çîyo ke kitabê M. Malmîsaniyî ra yeno famkerdiş, merdim eşkeno cayê edatê **pê**'yî de edatê **bi**'yî zî bixebitno. Kurmanckî de zî tayê çîyo winayîn esto. Mesela Kitabê Kadrî Yildirimî de, mîyanê veredatan de **bi** esto la **pê** çinî yo. La kitabê Kadrî Yildirimî de, sernuşteyêk de wina di nimûneyî estê:

bi wî.../bi we...(pê)

Ew xwendekarekî pir zîrek e, ez **bi wî** dizanim/ez **pê** dizanim.

Ew keçeke qure ye, ez **bi wî** dizanim/ez **pê** dizanim.³¹

Nê nimûneyan ra zî aseno ke veredatê **bi**'yî û **pê**'yî cayê yewbînan de ameyê xebitnayîşî. Cayo ke edatê **pê**'yî ameyo xebitnayîş, hetê manayî nê edatî cayê zemîrî zî giroto.

Roşan Lezgînî, Deniz Gunduzî û Grûba Xebate ya Vateyî, edatê **bi**'yî û edatê **pê**'yî cîya bi cîya nuştê û dayê şinasnayîş. Xwura cîya bi cîya zî nimûneyî dayê. Feqet gava ke merdim ewnîyeno nimûneyan ra tayê persgireyî/problemmî vejîyenê meydan. Çimkî nimûneyê ke seba edatê **bi**'yî ameyê nuştîş zafane merdim eşkeno seba edatê **pê**'yî zî bikar bîyaro. Nimûneyê ke seba edatê **pê**'yî ameyê dayîş xwura merdim eşkeno cayê pêrine de edatê **bi**'yî zî binusno. Hetta tayê kitabana de nimûneyê ke seba

³¹ Kadri Yıldırım, **Temel Aştırma ve Metinlerle Kürtçe Dilbilgisi (Kurmanci Lehçesi)**, Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de yaşayan Diller Enstitüsü Yayınları, Mardin 2012, r.273.

edatê **bi**'yî ameyê nuştiş kitabêko bîn de hema-hema eynî mana de seba edatê **pê**'yî ameyê nuştiş. Seba nimûneyî:

Bi peranê xo erînayo.³²

Pê peran gureyê xo virašto.³³

Mi **bi** vaştirîye vaş çînit.³⁴

Cenîke **pê** zanayîşê xo resaya o meqam.³⁵

Pê/bi peran gureyê xo virašto.³⁶

Nimûneyê ke bi edatê “**bi**” yî ameyê nuştiş ez do binusnî û dima cayê edatê **bi**'yî de ez o edatê **pê**'yî bikar bîyarî û bi no tewir bidî têver. Gelo farqê înan esto yan ney? Eger farqê înan esto wa bêro zanayîş, wa zelal bibo?

4.2.1. Nimûneyê Edatê “**bi**”yî

4.2.1.1. Nimûneyê Edatê “**bi**” yî yê Sebahattîn Gultekînî

Bi kewçike biwere.	“ Pê kewçike biwere.”
Bi maşîna xo şinê Amed.	“ Pê maşîna xo şinê Amed.”
Genimê xo bi paştî beno areye.	“Genimê xo pê paştî beno areye.”
Bi serrê xo şiyoy geyrayo.	“ Pê serrê xo şiyoy geyrayo.”

³² Gündüz (Edîtor) 2012, r.77.

³³ Gündüz (Edîtor) 2012, r.79

³⁴ Gündüz 2013, r.154.

³⁵ Lezgîn 2012, r.53.

³⁶ M. Malmîsanij 2015, r.148.

4.2.1.2. Nimûneyê Edatê “bi”yî yê Roşan Lezgînî

Ey bi pereyanê xwu herina.	“Ey pê pereyanê xwu herina.”
Ez bi qeleme nusena.	“Ez pê qeleme nusena.”
Ti eşkenî bi ey.	“Ti eşkenî pê ey.”
<i>Ez şina bi Dêrsim.</i>	“Ez pê/ver bi Dêrsim şina.”

4.2.1.3. Nimûneyê Edatê “bi”yî yê Deniz Gunduzî

Mi bi vaştirîye vaş çînit.	“Mi pê vaştirîye vaş çînit.”
To bi peranê xo herinayo.	“To pê peranê xo herinayo.”
Ey bi dest werd werd.	“Ey pê dest werd werd.”
<i>Ez şona/şina bi dewe.</i>	“Ez pê/ver bi dewe şina.”

4.2.1.4. Nimûneyê Edatê “bi”yî yê Gruba Xebate ya Vateyî

Bi qeleme nuşt.	“ Pê qeleme nuşt.”
Bi dest werd.	“ Pê dest werd.”
Bi peranê xo erînayo.	“ Pê peranê xo erînayo.”
<i>Ez şina bi Dîyarbekir.</i>	“Ez pê/ver bi Dîyarbekir şina.”
<i>Yeno bi dewe.</i>	“ Pê/ver bi dewe yeno.”

*Ez şina **bi** Dêrsim.*

*Ez şona/şina **bi** dewe.*

*Ez şina **bi** Dîyarbekir*

*Yeno **bi** dewe.*

Varyantê edatê **bi**'yî yê nê nimûneyan, mintiqayê bînan de “ver bi” yo. Beno ke tayê mintiqayan de “ver” kewto tena **bi** mendo. Çimkî gava ke merdim nimûneyan dano têver, hetê manayî de farq çinî yo. Xwura ziwano rojeyîn qisêkerdiş de kilm beno. Yanî ca-ca tayê çekuyî, prefîksî, yan zî sufîksî kewenê. Loma tayê mintiqayan de zî ihtîmalêko pîl “ver” kewto û bi mendo. Mesela ma nimûneyan bid têver:

Ez şina **bi** Dêrsim. Ez **ver bi** Dêrsim şina.

Ez şona/şina **bi** dewe. Ez **ver bi** dewe şina.

Ez şina **bi** Dîyarbekir. Ez **ver bi** Dîyarbekir şina.

Yeno **bi** dewe. **Ver bi** dewe yeno.

Nê pêro cumleyî hetê manayî wa eynî êsenê. La cumleyanê verênan de “ver” çinî yo û ê peyînan de esto. Yanî goreyê mintiqayan ra no çî beno di birrî. Birrêk de edatê “**ver bi**”yî yeno xebitnayîş, birrêk de zî “**ver**” çinî yo tenî “**bi**” yeno xebitnayîş. Feqet çîyo tewr balkêş cumleyanê **ver bi**'yî de kar peynî de yo. La cumleyanê **bi**'yî de kar peynîyê cumleye de nîyo. Eger merdim cumleyanê **bi**'yî de karî bîyaro peynî, manayê cumleye tayê xeripîyena. Mesela merdim cumleyê “ez şina **bi** Dîyarbekir” bikero “ez **bi** Dîyarbekir şina”, sankî manayê “ez û Dîyarbekir ma pîya şinê” vejîyeno. Yanî mana tayê xeripîyena. Feqet cumleyanê bînan de wina nîyo. Çîyêko bîn zî no yo; beno ke tayê mintiqayan de **bi** kewto. Mesela; “ez şina **bi** Dîyarbekir” bîyo “ez şina Dîyarbekir.” Yan zî no edat, dîyalektê mintiqayêke yo. La no edat kamcîn varyant beno wa bibo bala însanî anceno. Belkî siba roj hina baş zelal bibo.

4.2.2. Nimûneyê Edatê “pê”yî

Ez o nika zî nimûneyê ke bi edatê “pê”yî ameyê nuştiş binusî û dima zî cayê edatê **pê**'yî de edatê **bi**'yî bikar bîyarî.

4.2.2.1. Nimûneyê Edatê “pê”yî yê Roşan Lezgînî

Cinîke pê zanayîşê xo resaya o meqam.	Cinîke bi zanayîşê xo resaya o meqam.
Ez pê ereba ameya.	Ez bi ereba ameya.

4.2.2.2. Nimûneyê Edatê “pê”yî yê Deniz Gunduz

Ti pê lîngan şînî bi uca.	Ti bi lîngan şînî bi uca.
O pê erebe şîyêne bi Dîyarbekir.	O bi erebe şîyêne bi Dîyarbekir.
Ez pê tewerzin kolîyan şiknena.	Ez bi tewerzin kolîyan şiknena.
Şîma pê ey henekanê xo kenî/kenê.	Şîma bi ey henekanê xo kenî/kenê.

4.2.2.3. Nimûneyê Edatê “pê”yî Xebata Gruba Xebate ya Vateyî

Pê otobuse ame.	Bi otobuse ame.
Pê peran gureyê xo viraştî.	Bi peran gureyê xo viraştî.
To pê qalanê xo zerrîya ey şikite.	To bi qalanê xo zerrîya ey şikite.

Ma nê nimûneyan de vînenê ke cayê **pê**'yî de edatê **bi**'yî zî binusyo zaf farqêko muhîm nêvirazîyeno. Manayê cumleyan zaf nêvuryeno.

Xwura sey cor zî ameyo vatiş ke kategoriya Sebahattîn Gultekînî de veredatê “**pê**”yî çinî yo û M. Malmîsanij û Munzur Çemî zî nê edatî cayê yewbînan de xebitnayê.

4.3. DERHEQÊ EDATÊ “**PÊ**”YÎ Û ZEMÎRÊ “**PÊ**”YÎ DE

Roşan Lezgînî derheqê edatê **pê**’yî de çîyêko cîya vato. Goreyê Roşan Lezgînî ra; eger çekuyê “**pê**”yî, îşaretê şexsan yan çîyan bikero edat nîyo zemîr o. Di nimûneyî dayê:

“Ez zaf **pê** (bi ey/aye/înan) huyaya.”

“Çîyêk rê nêbeno, ez **pê** (bi ey) se bikerî.”³⁷

Gava merdim ewnîyeno zereyê parantezî ra edatê **bi**’yî reyna ameyo xebitnayîş. Nê nimûneyan de zî merdim eşkeno ‘**bi** û **pê**’yî cayê yewbînan de bikar bîyaro. Yanî eynî cumleye û eynî mana de, îsan eşkeno edatê **bi** yî û zemîrî **pê**’yî cayê yewbînan de bixebitno. Goreyê nê mantiqî ra merdim eşkeno cayê edatê **bi**’yî de û çekuyêka ey dima ra yena orte ra wedaro û cayê înan de zemîrê **pê**’yî bixebitno.

Yanî merdim eşkeno vaco, nameyî yan zî zemîrê ke çekuya **pê**’yî dima yenê merdim wedaro/bierzo çekuya **pê**’yî bena zemîr. Mesela:

Çiwa bide mi ez **pê marî** bikişî. (Edat) Çiwa bide mi ez **pê** bikişî. (Zemîr)

Tase bide mi ez **pê awe** bişimî. (Edat) Tase bide mi ez **pê** bişimî. (Zemîr)

La no çî tena Roşan Lezgînî nuşto. Mesela, M. Malmîsanijî hema hema eynî no mana de çekuyê **pê**’yî xebitnaya û na çekuye edat qebul kerda.

“Çîyêk rê nêbeno, ez **pê** (bi ey) se bikerî.” (zemîr) Roşan Lezgîn

“Ez zaf **pê** (bi ey/aye/înan) huyaya.” (zemîr) Roşan Lezgîn

³⁷ Lezgîn 2012, r.53-54.

“Fîraze **pê** nušto.” (edat) M. Malmîsanij

Nika merdim biewno nê cumleyan ra, xebitnayîş û manayê çekuyê **pê**’yî de farq nêaseno. Loma no çî ganî hina zî baş bêro zelalkerdiş. Çimkî cumleyê M. Malmîsanijî de name (qeleme) kewto û çekuyê **pê**’yî cayê nameyî giroto. Gelo na çekuye edata yan zemîr a?

4.4. BAZINEEDATÊ “BEYNTARÊ ... DE”YÎ

Bazineedatê “**beyntarê ... de**” sey aseno ke edatê kategorîya bazineedatan de yo. Kitabê Deniz Gunduzî, yê Munzûr Çemî, yê M. Malmîsanijî û yê Gruba Xebate ya Vateyî de derbas beno. “**beyn**” ra aseno ke na çekuye erebî ya. Yanî manaya **mîyanî** de ya. Varyant û formê na çekuye zî zaf ê. Mıntıqayê Licê û Pasûrî de zafane varyantê bînî yenê xebitnayîş. La çîyo balkêş mîyanê kirdan de na çekuye zafane bi varyantê tirkî û erebkî yena xebitnayîş. Ma nê varyantan mîyanê cumleye de nîşan bidi:

“**Beyntarê** înan **de** o ronîştîbî.”³⁸

“**Bêyntarê** înan **de** o ronîştîbî.”

“**Bênetarê** înan **de** o ronîştîbî.”

“**Beynateyê** înan **de** o ronîştîbî.”

“**Bênatê** înan **de** o ronîştîbî.”

“**Areyê** înan **de** o ronîştîbî.”

“**Mabeynê** înan **de** o ronîştîbî.”

“**Mabênê** înan **de** o ronîştîbî.”

“**Nabeynê** înan **de** o ronîştîbî.”

³⁸ Gündüz 2013, r.158.

“**Nabênê** înan **de** o ronîştîbî.”

“**Mîyanê** înan **de** o ronîştîbî.”

“**Orteyê** înan **de** o ronîştîbî.”

“**Wertê** înan **de** o ronîştîbî.”

Manayê bazineedatan no yo; tayê veredatî estê ke gava bêrê xebitnayîş ganî peydat zî înan dir bêro xebitnayîş. Yanî her di çekuyî yewbînan dir yenê xebitnayîşî. Kamcîn veredatî dima kamcîn peydat yeno dîyar o, hetta mecbûrî yo. Loma nê edatan ra **bazineedat** yan zî **veredat û peydat pîya** yeno vatiş. Feqet no bazineedato ke cor ameyo nuştîş merdim eşkeno veredat û peydatî cêr (r) a bikero. Yanî veredatê **beyntarê/mabênê/mîyanê** dima merdim eşkeno peydatê **ra**'yî zî bixebitno. Mesela;

Mîyanê înan **ra** vejîya û ame.

Tiya de cayê peydatê **de**'yî de peydatê **ra**'yî ameyo. Reyna, nimûneyê bazineedatê “**peyê ... ra**” de zî no çî esto:

Mêrdek **peyê** berî **ra** vejîya.³⁹

Na cumleye de merdim eşkeno peydatî wina bivurno;

“Mêrdek **peyê** berî **de** çî kar keno?”

Cayê peydatê **ra**'yî de peydatê **de**'yî zî yeno xebitnayîş. Wekîdina zî nimûneyî estê. Reyna, peydatê **ro**'yî zî bi no qaîde yeno xebitnayîş. Xwura Munzur Çemî, derheqê nê nimûneyan de varyantê çekuya **mîyanî** û peydatê **de, ra** û **ro**'yî pîya xebitnayê. Seba nimûneyî ma nê cumleyan bidi:

Beynatey ... de/beynatey ... ra/beynatey ... ro

Beynatey min û to **de** çîyê çîne bî.

³⁹ Gündüz (Editor) 2012, r.84.

Beynatey ma **ra** marêde sîya vêrd ra.

Raye **beynatey** Semsûr û Meletî **ro** şona.

Bi no tewer, bi taybetî kitabê M. Malmîsanijî û Munzur Çemî de zaf çekuyê ke bazineedatî yenê qebulkerdiş estê. Mesela nê kitaban ra merdim eşkeno nê nimûneyan binusno.

herinda (ca) ... de: (Ez **herinda (cayê)** şima **de** bî...)

hetê ... ra: (Şîyar **hetê** corî **ra** ame.)

pey ... de: (Xalê ey **pey** banî **de** ronştibi)

peyê/pê/peynî ... ra: (Kutik/sipe **peyê/pê/peynî** berî **ra** vejîya.)

Siba roj nê çîyan ser o, bi min go zaf şîrovevî û rexneyî bêrê kerdiş. Xwura ganî şîrove û rexneyî bêrê kerdiş ke tayê çî zelal bibê û ver bi standardîzasyonî wa şêrê.

Kitabê M. Malmîsanijî de çekuya **mîyanî** kategorîya peyedatan de ravêrena.

Ê şî dewijan **mîyan**.⁴⁰ *

Goreyê na cumleye ra merdim eşkeno peyedatî bikero veredat zî.

Ê şî **mîyanê** dewijan.

⁴⁰ M. Malmîsanij 2015, r.151.

* “Ê şî dewijan **mîyan**.” Na cumleye kitabê M. Malmîsanijî de seba nimûneyê peyedatan a. Mî zî M. Malmîsanijî rê e-mail şiravit û mi va, doranê ma de na cumleye wina yena vatiş: “Ê şî **mîyanê** dewijan.” Tîya de **mîyan** beno veredat. Loma mi gore her di şeklan de zî **mîyan** veredat o.

M. Malmîsanijî wina cewabê mi da: “To wina nušto: ... bi min her di cumleyan de zî 'mîyan' veredat o.” Ez nê cumleyan ser o fikirîyaya, mi fehm kerd ke nê cumleyan de "mîyan" **edat nîyo**. Çunke qaydeyê edatanê kirmanckî ra yew no yo: edatî mîyanê cumle de nêvurîne. Şeklê xo tim eynî yo. Yewna qayde zî no yo: Cînsîyetê edatan (nêrî û makî) çin o. Labelê cumleya to de "mîyanê dewijan" o, yanî yew îzafê ya û "mîyan" nêrî yo. Tîya de cînsîyetê "mîyan"î esto û "mîyan" name yo.

4.5. EDATÊ “DÎ DE”YÎ

Kirdkî de bazineedatê “**di ... de**” yî; zafê cayen de, **di** kewto tenî **de** mendo. Gava ke merdim metnanê zazakî waneno yan zî merdim bala xwu dano qisêkerdişê ziwane rojaneyî ser, no çî ca-ca xwu nîşan dano û bala merdimî anceno. Mesela mewlidê Kirdî yê Ehmedê Xasî de zaf cayan de bazineedatê “**di de**” yî ameyo xebitnayîş. Ma nimûne bidi:

Xaliqî hur dî muzeyyen kerdibî,

Hem **di** cennet **de** muxeyyer kerdibî.⁴¹

Be‘dê cû va, “Ey qelem nûştiş bike!”

Va “ ‘z **di** emrê to **de** wa, vatiş bike!”⁴²

Reyna, qisêkerdişê ziwane rojeyînî de zî keweno vernîya însanî. No nimûneyo cêrîn zafê cayan de yeno vatiş:

“**Di** Dinya **de** to pîsêrî yew çinî yo!”

Na cumleye de zî aseno ke **di** eslê xwu de esto. Yanî, bazineedatê **di ... de** yî lehçeya zazakî de eslê xwu de esto. Feqet hindî zafê cayan de nîno xebitnayîşî. Derheqê nê edatî de, Roşan Lezgînî û N. Celalî kitabê “Memê Alan”î yê Roger Lescotî de, binê “**vateyê açarnayoxan**” de zî qal kerdo. Vato: “Yeno zanayîş ke kirdkî de veredat û peydatê pîya “**di ... de**” esto la zafê cayan de veredat kewto, peydat mendo.”⁴³

Derheqê nê bazineedatî de tayê xebatkarê ziwani yê kirdan vanê; ziwane nuşteki/nuştişî de ganî **di** bêro xebitnayîş. Tayê înan zî vanê, seba ke ziwane ra kewto û sey tabîî bîyo vinî loma hewce nîyo ke bêro nuştiş. Feqet kitabê ke ez înan ser o xebitîyena hema-hema pêrine de no bazineedat ameyo nuştiş.

⁴¹ Ehmedê Xasî, **Mewlidê Kirdî**, r. 29.

⁴² Ehmedê Xasî 2013, r.23.

⁴³ Roger Lescot (Arêkerdox), **Memê Alan**, Roşan Lezgîn & N. Celalî (Kurmanckî ra Tadayîş), Weşanxaneyê Roşna, Dîyarbekir 2014, r. 6.

4.6. EDATÊ “RO”YÎ

No edat, kitabê Deniz Gunduzî, yê Munzur Çemî û yê Grûba Xebate ya Vateyî de katagorîya peyedatan de derbas beno. Kitabê Roşan Lezgînî û yê M. Malmîsanijî de hem katagorîya veredatan de hem zî kategorîya peyedatan de derbas beno. Kitabê Sebahattîn Gultekînî de xwura ma cor zî vat bi, kategorîya edatan çinî ya la nimûneyan de no edat hem sey veredatî hem zî sey peyedatî ameyo xebitnayîşî. Feqet gava ke merdim biewnîyo nimûneyan ra bi xwu aseno ke edatê **ro**'yî hem veredat o hem peyedat o. Nimûneyî:

Zîlane **ro** aye gêrena.⁴⁴ (Veredat)

No kar **ro** to nêkeweno!⁴⁵ (Veredat)

Ro ci wayîr vecêno.⁴⁶ (Veredat)

Cilî **ro** to kewtê. (Veredat)

Embazî koy **ro** yenê.⁴⁷ (Peyedat)

Ma nêrdewane **ro** ameyî, ê asansor **ro** ameyî.⁴⁸ (Peyedat)

Şiwani bizê xo deşte **ro** yan ko **ro** berdî?⁴⁹ (Peyedat)

Mar dare **ro** ancîya bi cor.⁵⁰ (Peyedat)

Ez kendal **ro** yena. (Peyedat)

Nê nimûneyan de zî aseno ke edatê **ro**'yî goreyê manayê xwu ra hem beno veredat û hem zî beno peyedat.

⁴⁴ Gultekîn 2010, r.76.

⁴⁵ Lezgîn 2012, r.54.

⁴⁶ M. Malmîsanij 2015, r.149.

⁴⁷ Gultekîn 2010, r.76.

⁴⁸ Lezgîn 2012, r.56.

⁴⁹ M. Malmîsanij 2015, r.153.

⁵⁰ Gündüz 2013, r.157.

4.7. PEYEDATÊN “RA” Û “RO”YÎ

Ca-ca peydatê **ra** û peydatê **ro**'yî benê ra têmîyan. Nê di cumleyê cêrînî mesela weş zelal kenê.

“Ez Licê ra bi ereba nêameya, heta dewe raye **ra** ameya.” (Lice'den araba ile gelmedim, köye kadar yürüyerek geldim, ayakla geldim.)

Manayê na cumleye no yo; yanî ez bi esparî nêameya. Ma vajin, ereba yan zî astor/herr çinê bi, loma ez zî bi lingan raye ra ameya.

“ Ez raye **ro** ameya .”

Manayê na cumleye zî; yanî ez kendal ro, daristan ro, yan zî pêraye/şiveraye ro nêameya, dîrekt raye ro ameya. Reyna, no nimûneyo cêrîn zî muhîm o:

“Ez dewe **ra** şîya.” û “Ez dewe **ro** şîya.”

Manayê înan zaf cîya yo. Nimûneyo verên de manayê ey no yo; ez xwura dewe de bîya la sebebêk vejîya û ez dewe ra vejîya wa û şîya. Nîmûneyê diyîne de; dewe serê rayê mi de ya. Yanî hem vernîya dewe de rayê mi esta hem zî peynîya dewe de rayê mi esta. Ez zî şina mîyanê dewe û dima dewe derbas kena û rayê xwu ro dewam kena. Yan zî ma vajin ez Dîyarbekir ra şina Mûş û kaptanê otobuse ra persena; “Ti rayê Çewlîgî **ro** şenê Mûş yan rayê Pasûrî **ro** şinê?

Bal/baldarî: Tayê çekuyê estê, sey **ra**, **ro** yî çekuyî karî (fîl) yê. Nê çekuyî û edatê “**ra**, **ro**”yî ganî nêbê têmîyan ra. Eslê xwu de nê çekuyî edat ê la hetkarîya karan kerdo û xususîyetê xwu, yanî xususîyetê edatan vindî kerdo. Nimûneyî:

Ez kewta **ra**.

Pêrodayîş/lej de min o vist **ra**.

Ti rehet nêvindenê **rade** şo keye!

Çila bikişne **ro**.

Kendal hame verê ma de nişt **ro**.

Tiya de çîyo balkêş no yo; gava ke çekuyên “**ra, ro**”yî bêrê vernîya çekuye a gavî çekuye wa dusyaye/zeleqnaye nusyenê. Eger ma nimûneyanê corînan reyna binusni wina benê:

Ez **rakewta**.

Pêrodayîş/lej de min o **ravist**.

Ti rehet nêvindenê **rade** şo keye!

Çila (bi) **rokişne**.

Kendal hame verê ma de **ronişt**.

Cayê “**ra, ro**”yî goreyê mintiqayan ra vuryeno. Ma vajin mintiqaya Licê û Pasûrî de “**ra, ro**” zafane çekuyan ra dima, yanî karî dima nusyenê û seke cor zî aseno çekuyan ra cîya nusyenê, mintiqaya Siwêreki de çekuyan ra ver yenê û çekuyan wa dusyaye nusyenê.

4.8. DI EDATÊ KE AMEYÊ TÊVER

Seke cor zî ameyo nuştiş cayo ke di edatî ameyê têver tayê çîyo eluzîyaye esto. Gramerê zazakî de derheqê nê çî de, çîyêk nêameyo nuştiş. La çîyêko yeno zanayîş û famkerdiş ganî di edatî nêrê têver. Ziwananê bînan de zî bi no qayde, yanî di edatî nînê têver. Mesela ziwanê tirkî de zî çîyo ke winayîn çinî yo. Feqet zazakî de tayê çîyê eluzîyayeyî estê. Mesela:

Mi **rê goreyê** bincewêk/vincewêk ra lak lazim o.

Tîya de peydat **rê**'yî û veredat **goreyê**'yî ameyê têver. Reyna;

Mih zî verê berî **de bi** heyecan çikilîyabi û ewnîyêne Axayî ro.⁵¹

Na cumleye de zî di edatî ameyê têver. Ganî no çî zî zelal bibo. Feqet hetê manayî ra sankî merdim eşkeno vîrgul bîyaro mîyanê înan û bi no şekil di edatan cêra bikero. Yan zî cayê tayê çekuyan bivurno û edatan yewbînan ra cîya bikero. La a gavî zî qaîdeyêko newe virazîyeno. Yanî merdim vajo; gava ke di edatî bêrê têver ganî bi vîrgul bêrê cîyakerdiş. Yan zî raştnuştiş de ganî di edatî nêrê têver. La nê çekuyî edatê yan ney, cumleye raşt ameya nuştûş nêameya nuştûş, manayê çekuyan vuryayo yan ney, nê çî ganî baş zelal bibê.

Reyna, çekuyê **semed** û **semedê** zî winayê. Çekuyê **semed** û **semedê** kitabê Roşan Lezgînî de sey edatanê cîya bi cîya ameyê nuştiş. Kitabê M. Malmîsanijî de çekuyê **semedê** ameya nuştiş. Tayê cayan de gava ke edatê **semedî** yeno xebitnayîş di edatî yenê têver. Mesela:

No **semed ra** însanî teber ra ...⁵²

No **semed ra** wi zaf qehrîyeno ...⁵³

Nê cumleyan de edatê **semedî** û edatê **ra'yî** ameyê têver. Tîya de sey aseno edatê komî/grûbe virazîyayê. No çîyî zî taybetmendîyêkê edatan a. Yanî, di edatan manayê edatêk viraştî. Yan zî çekuyê **semedî** goreyê cayê xwu ra, manayê/karê xwu vurneno. Tîya de manayê îşaretê şexsan yan çîyan esto. Mesela, cumleya diyîne merdim eşkeno wina bivurno;

Semedê kamî ra zaf qeherîyayo?

Semedê **to** ra o zaf qeherîyayo. Yan zî, semedê **peran** ra o zaf qeherîyayo.

Nê cumleyan de seba ke zemîr yan zî name nusyayo çekuyê **semedî** edat a û bi sereyê xwu ya. Yanî di edatî nêameyê têhet. Reyna:

Saete new **ra heta** des ma nabên dayê xebate.

⁵¹ Nêşite 2012, r.20.

⁵² Gündüz (Editor) 2008, r.19.

⁵³ Gündüz (Editor) 2008, r.21.

Sey aseno tîya de zî di edatî ameyê têver. Loma, nê edatî yan zî nê grûbê edatan ganî hina baş bêrê zelalkerdiş.

4.9. EDATÊ “GORE/GOREYÊ”YÎ

Edatê **gore/goreyê** yî tirkî ra kewto mîyanê zazakî. La çîyo balkêş, no edat hem cayê veredatî de yeno xebitnayiş hem zî cayê peydatî de yeno xebitnayiş. Mesela;

Goreyê to kam rind o?⁵⁴

Çunke mi **gore** kitab qasê kovarî rengin nîyo.⁵⁵

Seke cor zî aseno no edat eynî mana de hem bîyo veredat hem zî bîyo peydat. Hetta eynî cumleye de merdim eşkeno cayê ey bivurno. Yanî veredatî bikero peydat yan zî peydatî bikero veredat. Mesela cumleya yewîne merdim eşkeno wina zî binusno:

To **gore** kam rind o?

Feqet goreyê îzehetê M. Malmîsanijî ra ganî edat eynî cumleye de nêşko cayê xwu bivurno. Eger bieşko cayê xwu bivurno a gavî edat nîyo. Sedemê nê eluzîyayîşî, beno ke na çekuye seba ke bi eslê xwu kurdkî nîya loma zî. Çimkî cayê nê edatî de mintiqaya Licê û Pasûrî de edatê **bi**'yî zî yeno xebitnayiş. Mesela cayê cumleyê “**Goreyê** to kam rind o?” de wina vajîyeno:

Bi to kam rind o?

Bi min Dîlberê rind a.

Feqet edatê **gore/goreyê**'yî manayêka bîne de zî yeno xebitnayiş. Mesela;

Mi rê **goreyê** bincewêk/vincewêk ra lak lazim o.

⁵⁴ Gündüz 2013, r.154.

⁵⁵ Seîd Aspar, “Çimê Ma Roşt Bo”, **Kovara Şewçilayî**, Berdan Matbacılık, Hûmare 1, İstanbul 2011, r.82.

Tîya de manayê edatê “qasê” dano. Yanî manayêka bîne de ameyo xebitnayış. Cayê nê edatî na rey merdim eşkeno edatê **qasê** zî bixebitno.

Mi rê **qasê** bincewêk/vincewêk ra lak lazim o.

4.10. VEREDATÊ “VERA”YÎ

Seba na çekuye M. Malmîsanijî wina nimûne dayo:

Vera na hetkarîya to ez zaf şermezarbîya.⁵⁶

Feqet bi no tewir merdim eşkeno nê veredatî bikero peydat zî.

Na hetkarîya to **vera** ez zaf şermezar bîya.

Tîya de çekuyê **vera** bîya peydat. Goreyê malumatanê M. Malmîsanijî ra ganî na çekuye edat nêbo. Feqet manayê na çekuye ra eyseno ke edat a; “Nika hewa germ o, ma **vera** şanêk şî dewe.” Na cumleye de çekuyê “vera” edat a.

4.11. VEREDATÊ “VERÊ/VERÎ”YÎ

Verê destpêkerdişê mahkema ma salone de bî.⁵⁷

Na çekuye manayê demî/wextî nîşan dana. Yanî manayê na çekuye esto. Seba ke manayê aye esto çi ra bîya edat? Yanî, çekuyêkê manayê demî/wextî nîşan danê çi ra edat ê? Bi goreyê tarîfkerdişê edatan ra tayê çekuyî teber de manenê. Çimkî tayê çekuyî bi sereyê xwu manayê înan esto. Seke cor zî vajîyayo goreyê Qanatê Kurdoyî ra tayê çekuyî bi eslê xwu nameyê la rolê edatan girewto. Loma ganî edatî û tarîfkerdişê edatan ser o hina xebatê hira bêrê kerdiş.

⁵⁶ M. Malmîsanij 2015, r.150.

⁵⁷ M. Malmîsanij 2015, r.150.

4.12. VEREDATÊ “BAHDÊ”YÎ

Çekuyê **bahdê** zıwanê erebî ra kewta mîyanê lehçeyê zazakî. Na çekuye kitabê M. Malmîsanijî de sey veredatî ameya nuştiş. Manayê demê/wextê **pêra**, **dima**’yî dana. Eger çekuyê bahdê edat bo ganî çekuyê **pêra** û **dima** zî edat bêrê qebulkerdiş. La nê di çekuyê mîyanê kategorîyan de çinî yê.

4.13. ÇEKUYA “ZÎ”YÎ

Kitabê Sebahattîn Gultekînî de çekuyê **zî**’yî edat ameya qebulkerdiş û nimûneyî ameyê dayîş. Goreyê Sebahattîn Gultekînî ra, edatê **zî**’yî cayê **jî**’yê kurmanckî de yeno xebitnayîş.

Şima **zî** biyerê ewta./jî⁵⁸

Feqet na çekuyê kitabê xebatkarane zıwanî yê bînan de kategorîya bestoxan de ameya qebulkerdiş.

4.14. ÇEKUYA “HETA/HETANÎ”YÎ

Na çekuye kitabê M. Malmîsanijî de veredat ameya qebulkerdiş. La kitab de seba na çekuye nimûneyî nêameyê dayîş. Eynî çekuye kitabê Roşan Lezgînî de mîyanê bestoxan de ameya nîşandayîş. Seba na çekuye kitabê Roşan Lezgînî de kategorîya bestoxan de no nimûne ameyo nuştiş.

Ez emşo şan ra **hetanî** siba aya menda.

⁵⁸ Gultekîn 2010, r.77.

Seba ke M. Malmîsanijî nimûneyî nênuştô ma nêşkenê edatê **hetanî** û bestoxê **hetanî** bid têver. Çimkî gava ke merdim nimûneyan bido têver a gavî, bi çi mana çekuye bena edat û bi çi mana bena bestox belî beno. Na çekuye kitabê Qanatê Kurdoyî de mîyanê edatan de ameye nuştîş û seba na çekuye wina nimûneyêk ameyo nuştîş:

Lê bûbû xeyset şevê **heta** sibê ji vî serî otaqê **heta** wî serî dihat û diçû.⁵⁹

4.15. ÇEKUYA “REYDE”YÎ

Na çekuye kitabê M. Malmîsanijî û Sebahattîn Gultekînî de edat ameya qebulkerdiş, kitabê Roşan Lezgînî de bestoxe ameya qebulkerdiş. Seba na çekuye kitabê Roşan Lezgînî de, kategoriya bestoxan de no nimûne ameyo nuştîş.

Roşna maya xo **reyde** şîya dewe.

Feqet mîyanê beşanê bînan de zî ameye nuştîş ke, **dir/rejde/de/ya** varyantê yewbînanê û edat ameyê qebulkerdiş.

4.16. EDATÊ NEGATÎFÎ “BÊ, ME, NÊ, NÎ, NÎ”YÎ

Kitabê Munzur Çemî de na kategoriye edatan zaf balkêşa. Munzur Çemî bi nê prefiksan/qertafan çekuyên ke viraştê înan ra vato **edatê negatîfî**. Çemî, nê prefiksî çekuyanê bînan wa dusyaye/zeleqnaye nuştê. (Çekuyê **bê** yî cîya nuştê, xwura na çekuye kitabênê bînan de zî veredat ameya qebulkerdiş û cîya nusya ya.) Xwura yeno zanayîş zî ganî edatî çekuye ra cîya bêre nuştîş. Munzur Çemî wina nimûneyî dayê:

Bê mamostayî domanî ...

Meke! Meşo! Mebe!

A awe **nêşimena**,

⁵⁹ Qanqê Kurdo 2013, r.273.

Zere ewro **nîna**.

Ez **niwena**.

Nê nimûneyî nêkewenê mîyanê tarîf û kategorîyê edatan. Dîyalektê kurdkî ê bînan de zî tarîfêko winayîn yan zî nimûneyê winayînî çinî yê. Loma bi min nê prefîksê negatîfî edat nîyê.

4.17. TAYÊ ÇEKUYÊ KE SEY GRÛBE NUSYENÊ

xwu **bi** xwu

roj **bi** roj

yew **bi** yew

Wext **ra** wext

se **ra** se

ca **ra** ca

Tîya de çekuyê **di** û **ra**'yî, di çekuyê ke eynî yê/digark benê, yewbînan wa girê dayê. La nê grûbê çekuyan edat ê yan bestox ê benê têmîyan ra. Derheqê nînan de kitabên gramerî yê kirdkî de malumatî çinî yê la tenî Roşan Lezgînî grûbê **bi**'yî mîyanê nimûneyanê bestoxan de nîşan dayê û Roşan Lezgînî wina nimûneyêk dayo:

Yew **bi** yew vejîyayî ameyî.

Eger merdim biewno tarîfkerdişê bestoxan ra nê grûbê çekuyan, sey grûbe karê bestoxan kenê. La çekuyê **bi**'yi reyna zî manayê edatî de ya. Kurmanckî de na grûbe tayê cayan de seba edatî ameyê xebitnayîş. Mesela kitabê Kadrî Yildirimî de seba nimûneyê **bi**'yî cayêk de wina di cumleyî ameyê nuştîş:

Ew **sê bi sê** derketin.

Ferîşte **ref bi ref** daketin.⁶⁰

Kitabê Qanatê Kurdo de zî di çekuyê ke digark/dibare benê seba nê edatê wina nimûneyî ameyê xebitnayîş.

roj **bi** roj

dest **bi** dest

sal **bi** sal⁶¹

Seba ke lehçeyên kurdî ê bînan de na grûbe edat ameya qebulkerdiş bi ihtîmalêko pîl zazakî de zî edat a. Grûba bîne ya **ra**'y'i bi eynî mantiq virazîyaya loma na grûbe zî edat a.

⁶⁰ Yıldırım 2012, r.271.

⁶¹ Qanatê Kurdo 2013, r.261.

BEŞO PANCIN

5. METNANÊ ZAZAKÎ DE XEBITNAYÎŞÊ EDATAN RA NIMÛNEYÎ

Zazakî de edatî sey hîrê birran ameyê kategorîzekerdiş. Edatê ke tesbît bîyê min goreyê kategorîyan ra nuştî. La seke mi zereyê tezî de zî nušto kategorîyê xebatkaranê ziwani tam yewbînan nêgêrinê. Mi bi giranî kategorîyê M. Malmîsanijî bikar arda. Le seba ke kategorîyê M. Malmîsanijî bi heme varyant û formanê mintiqayan ameya nuştîş zaf hîra û giran a, mi kategorîyê M. Malmîsanijî û kategorîyê xebatkaranê ziwani yê bînan dayî têver. Şeklo sade/standard o, yo ke goreyê mintiqayan ra zafane yeno xebitnayîşî, mi o form/varyant nuşt. Yanî, zafane, edatê ke hetê xebatkaranê ziwani ra bi muşterekî ameyê qebulkerdiş mi ê nuştê.

Nê beşî de, mi metnê zazakî wendî û edatê ke nê metnan de derbas benê min tesbît kerdî. Edatê ke mi tesbît kerdî seba nimûneyî, goreyê kategorîyanê înan ra mi nuştî. Mi nimûneyî zî sey a, b, c ... yî rêz kerdî. Nimûneyo verên, o yo ke bi estare (*) yo nimûneyê kitabê M. Malmîsanijî yo. Ê bîni ê metnan zazakî yê.

Xwura edatê ke bi zafane yenê xebitnayîşî û înan ser o muşterekî esta mi ey nuştê û goreyê kategorîyan ra zî rêz kerdê. Dima, seba ke ma waşt giraniya tezî nê beşî ser o bo mi nimûneyî cîya bi cîya metnan ra arêdayî û nuştî. Nimûneyî hem metnanê kahan ra hem zî metnanê neweyan ra mi arêdayî. Reyna ma waşt çeşidê metnan cîya bi cîya bo ke wa nimûneyî cayê xwu bigêrê. Mesela nimûneyî mewlid, hîkaye, roman, şîir, folklor, sîyaset û tarîxî ra weçînîyayê.

5.1. NIMÛNEYÊ VEREDATAN

5.1.1. bê:

Zelale **bê** dadîya xwu nêşîyêna cayêk.*

a. Çende ray **bê** masîwa bi hemdê ma,

Labelê nêrê hîsaban çendê ma.⁶²

b. Nîya nêbeno, bê xo re bizewijîye; **bê** cinî keye nêbeno.⁶³

c. Çimê **bê** gillî û **bê** roşna

Eke çimî bihesebîyê.⁶⁴

d. **bê** xeberêka xeyrêne

bê mizgîna pawita⁶⁵

e. **Bê** zerrîya xo, xo pîze de vat:⁶⁶

f. Mîratê solê ke hê mi pay de **bê** puncan linganê mi de nêvindenê.⁶⁷

5.1.2. bi:

(I) : **Bi** qelema xwu îmza kerd.*

a. Ez **bi** bîsmîllahî îbtîda kena,

⁶² Ehmedê Xasî 2013, r.11.

⁶³ Gündüz (Editor) 2008, r.10.

⁶⁴ J. Îhsan Espar, **Dilopê Zerrî**, Weşanxaneyê Vateyî, îstanbul 2008, r.12.

⁶⁵ Espar 2008, r.34.

⁶⁶ Nêşite 2012, r.30.

⁶⁷ Nêşite 2012, r.35.

Raziqê ‘aman û xasan pîya kena.⁶⁸

b. Çende ray bê masîwa **bi** hemdê ma,

Labelê nêrê hîsaban çendê ma.⁶⁹

c. Ez qesem daîm **bi** zatê to kena,

Hem **bi** yew yew ez sifâtê to kena.⁷⁰

d. Zilkîf yenû **bi** gamî.⁷¹

e. Embazey, **bi** raştey.⁷²

5.1.3. bi:

(II) : Ez şina **bi** Dîyarbekir.*

a. Celadet Bedîrxan şino **bi** Almanya. Dima şino **bi** Sûrîye...⁷³

b. Bize pê gênê, erzenê **bi** erd.⁷⁴

c. Ez ha şin, xatir **bi** (bû) tu, ...

Qey xatir **bi** mi, ...?⁷⁵

5.1.4. di:

Ehmed vano: “Ezo **di** dadê Delû Fikrê zit...”*

⁶⁸ Ehmedê Xasî 2013, r.11.

⁶⁹ Ehmedê Xasî 2013, r.11.

⁷⁰ Ehmedê Xasî 2013, r.11.

⁷¹ Malmîsanij (Arêkerdox), **Folklorê Ma Ra Çend Numûneyî**, Berdan Matbaacılık, İstanbul 2000, r.24.

⁷² Malmîsanij (Arêkerdox) 2000, r.141.

⁷³ Murad Caşad, “Romananê Mehmed Uzunî de Enstrumanê Muzîkî”, **Kovara Şewcîlayî**, Berdan Matbaacılık, İstanbul 2011, r.36.

⁷⁴ Gündüz (Editor) 2008, r.11.

⁷⁵ Gündüz (Editor) 2008, r.26.

- a. Bengz û reng nêmendbi **di** rîyê înan⁷⁶
- b. Ma to rê Zîne ronin **di** qonaxa Memê Alan, paytextê Mexrîbîyan⁷⁷
- c. Şewe nêmeyê şewan şima geyrenê **di** kerxanan û meyxanan⁷⁸
- d. Geyrayne **di** mîyanê bajarê Mexrîbîyan⁷⁹
- e. Hende merdimêko şîrin o, pêkewte yo, eke emsalê ey çin o **di** rîyê erdan⁸⁰

5.1.5. fenê/sey:

Kurdan sey şêran xo ver ro da.*

- a. “Qedrê yê kamo bigîro bêrîya,

Zey Muhemmed Ehmedî bîyaro dunya.”⁸¹

- b. Yanî nê haca w’ tîya, enka w’ verî,

Qet çinî bî, hem çinî kê, **zey** verî.⁸²

- c. Hîkmetê rengê herrî, însanî pê,

Hergo yew rengêke bî, nêbî **zey** pê.⁸³

- d. ... mîyanê kirmancan de **sey** kirdasan koçerîye çin a.⁸⁴

- e. ... a zî **sey** cinîyanê cîrananê xo, ...⁸⁵

⁷⁶ Roger Lescot (Arêkerdox) 2014, r.65.

⁷⁷ Roger Lescot (Arêkerdox) 2014, r.66.

⁷⁸ Roger Lescot (Arêkerdox) 2014, r.71.

⁷⁹ Roger Lescot (Arêkerdox) 2014, r.84.

⁸⁰ Roger Lescot (Arêkerdox) 2014, r.115.

⁸¹ Ehmedê Xasî 2013, r.15.

⁸² Ehmedê Xasî 2013, r.18.

⁸³ Ehmedê Xasî 2013, r.25.

⁸⁴ Canşad, “Romananê Mehmed Uzunî de Enstrumanê Muzîkî”, **Kovara Şewcilayî**, r.43.

⁸⁵ Gündüz (Editor) 2008, r.80.

f. Sey her roje bêkeyf nîyo.⁸⁶

g. Kurdan sey şêran şeran kerdê.

5.1.6. hendê:

Torbayê to **hendê** giran o.⁸⁷

a. Destê mi qey **hende** tersenê?⁸⁸

b. La **hende** kî tersenê.

c. Gelo kêneya xo **hende** nêzdîyê yew camêrdî de bivîno porê xo rûçiknena?⁸⁹

5.1.7. heta/heya/hetanî:

a. ... ma do xo rê **heta** erey dîwan bikerdêne.⁹⁰

b. **Hetanî** ke Axa şîyêne zere û **hetanî** ke ke masa xo ser o ronîştêne ...⁹¹

c. ... **hetanî** zereyê Mûşî amebi.⁹²

d. ... **hetanî** aşma adare hetê Lezgînî wa nêşêro.⁹³

e. Yê **hetta** çewres serre kerde tamam,

Tim di qelbê yê de bî Rebbul-enam.⁹⁴

f. Ez ha giran-giran şina, şima **heta** bêrê.⁹⁵

g. **Heta** dewe ez taqîp kerda.

⁸⁶ Gündüz (Editor) 2008, r.80.

⁸⁷ Bedriye Topaç, **Bero Sûr**, Weşanxaneyê Roşna, Diyarbakir 2012, r.6.

⁸⁸ Topaç 2012, r.6.

⁸⁹ Topaç 2012, r.7.

⁹⁰ Nêşite 2012, r.29.

⁹¹ Nêşite 2012, r.18.

⁹² Nêşite 2012, r.23.

⁹³ Nêşite 2012, r.28.

⁹⁴ Ehmedê Xasî 2013, r.45.

⁹⁵ Nêşite 2012, r.31.

5.1.8. pê:

Pê pêran gureyê xwu virašto.*

a. Putê, wilay tû **pê** awir' çimon ez xapênaya.⁹⁶

b. **Pê** muşerref bê eno 'erş û felek,

Hem mufferreh bê bi yê herçî melek!⁹⁷

c. De ez mal **pê** se kena, kes xwu reyde mal nêbeno goran⁹⁸

d. A wû biray xwi hinî **pê** şa bîy.⁹⁹

e. Ger ti yew mewlûd xwu rê wendiş bidê,

Lazim o tertîb bizanê, **pê** bidê.¹⁰⁰

f. Belkî yew-yew lazim ê, vacin şima,

Pê bizanê pîlîyey ay şahê ma.¹⁰¹

g. Hezretî Siddîqî vato yew kelam,

Baş bizanê, **pê** bigîrê xas û 'am:¹⁰²

h. Çimkî heddê herf û sewtan qet nîyo,

Sirrê xellaqê cîhan **pê** vacîyo!¹⁰³

⁹⁶ Malmîsanij (Arêkerdox) 2000, r.83.

⁹⁷ Ehmedê Xasî 2013, r.46.

⁹⁸ Roger Lescot (Arêkerdox) 2014, r.143.

⁹⁹ Malmîsanij (Arêkerdox) 2000, r.202.

¹⁰⁰ Ehmedê Xasî 2013, r.13.

¹⁰¹ Ehmedê Xasî 2013, r.14.

¹⁰² Ehmedê Xasî 2013, r.15.

¹⁰³ Ehmedê Xasî 2013, r.19.

i. Erê, wilay çem û çaxil **pê** şonena.¹⁰⁴

5.1.9. qandê/seba/semedê:

Ez **qandê** to vana.*

a. Di xortê dîyarbekirijî **seba** xebate trene wenişenî, şonî Îstanbul.¹⁰⁵

b. Karwanê ke uca ra vîyerenî, **semedê** arisayîşî, **semedê** awe uca de ronanî.¹⁰⁶

c. ... nêbo ke **semedî** çend qurişanî hukmat ...¹⁰⁷

d. –La-law merdim **seba** peran dano nê sêwiran ro.¹⁰⁸

5.1.10. qasê:

a. Çunke mi gore kitab **qasê** kovarî rengin nîyo.¹⁰⁹

b. Ge-ge zî **qasî** ke Axa bişinawo vengê xo berz kerdêne û vatêne.¹¹⁰

c. Hema **qasî** ke ez agêrêne ti mi rê biamêne rehme do se bîyêne?¹¹¹

d. ... vewra ke **qasî** vincewêke bî ser de dêne ra şîyêne.¹¹²

e. Evdila Begî babî xo ra vato, wilay paşa ti bi înan ra **çiqas** embazê kenî, bikir, ti înan rê **çiqas** xizmet kenî, bikir, la yew roj bîyero ê sere tu ti ra bikî.¹¹³

¹⁰⁴ Malmîsanij (Arêkerdox) 2000, r.83.

¹⁰⁵ Gündüz (Editor) 2008, r.56.

¹⁰⁶ Gündüz (Editor) 2008, r.56.

¹⁰⁷ Kurij, “Tarîxê Ma ra Çend Portreyî”, **Kovara Nûbiharî**, r.22.

¹⁰⁸ Nêşite 2012, r.21.

¹⁰⁹ Aspar, “Çimê Ma Roşt Bo”, **Kovara Şewçilayî**, r.82.

¹¹⁰ Nêşite 2012, r.19.

¹¹¹ Nêşite 2012, r.24.

¹¹² Nêşite 2012, r.30.

¹¹³ Kurij, “Tarîxê Ma ra Çend Portreyî”, **Kovara Nûbiharî**, r.21.

5.1.11. ro:

Ro ci wayîr vecêno.*

a. To silam **ro** ma kamî dawo?¹¹⁴

b. Silam **ro** min dawo.¹¹⁵

c. Da-des cendirmeyan sungîyê xo gilê çekan de dorme **ro** meydan girewtbî
...¹¹⁶

d. ... **ro** asmên bîyêne berz şîyêne.¹¹⁷

e. Dor **ro** ci girewto.

f. Vatişê ey **ro** ma nêameye.

g. Ma raye de **ro** yewbînî vejîyayî.

5.1.12. tewlî/tevê:

Tewlê lajanê xwu wa ame.*

a. Bizê ma **tevê** bizêkanê xwu wa bîyê vinî.

b. Mi **tevê** potan/cilan wa xwu eşt awa çemî.

¹¹⁴ Gündüz (Editor) 2008, r.47.

¹¹⁵ Gündüz (Editor) 2008, r.47.

¹¹⁶ Huseyîn Karakaş, “Hêliyê Serê Tûjik Bavayî”, **Kovara Nûbiharî**, Hûmare 118, Cild 15, İstanbul 2012, r.77.

¹¹⁷ Nêşite 2012, r.41.

5.1.13. ver bi:

Korja ver bi rez şîya.*

- a. ... polanê xo keno a û **ver bi** Filîtî şino ...¹¹⁸
- b. Meh derhal fek lajê xo ra vera da û **ver bi** Axayî şî.¹¹⁹
- c. ... uskut-uskut **ver bi** çadira keyeyê Eçe rayîr kewt.¹²⁰
- d. Eşî senî ke cewab aye ra girewt, agêra **ver bi** çadira xo da ra.¹²¹
- e. Ez **ver bi** Dîyarbekir şîna.

5.2. NIMÛNEYÊ PEYEDATAN

5.2.1. a:

Ser a vinderto.*

- a. Aqil esto aqilî ser ra.¹²²
- b. Banan ser ra geyrena.¹²³
- c. Dest destî ser ra esto.¹²⁴
- d. Di Dinya de mêrde ey ser a çînî yo.

¹¹⁸ Gündüz (Editor) 2008, r.16.

¹¹⁹ Nêşite 2012, r.21.

¹²⁰ Nêşite 2012, r.50.

¹²¹ Nêşite 2012, r.51.

¹²² Malmîsanij (Arêkerdox) 2000, r.134.

¹²³ Malmîsanij (Arêkerdox) 2000, r.67.

¹²⁴ Malmîsanij (Arêkerdox) 2000, r.139.

5.2.2. de:

Welat **de** çi esto çi çin o?*

a. Her nefes **de** vacê, hemd û şukrê to,

Wacib o bêşubh ancî heqqê to.¹²⁵

b. Hem bedil **de** rehmete w' keyf û surûr,

Nazilê qelbî bibo hem feyz û nûr.¹²⁶

c. Cennetê Fîrdewsî **de** hetta heta.

Bes nîyo? Hendî çi vacî ey feta?¹²⁷

d. ... Zikîf Beg o dikanan **di (de)**,

Sewlê surî lingan **di (de)**,

Misheb serê çokan **di (de)**,

Cixara miyanê giştan **di (de)**.¹²⁸

e. Voreko hewl, koz **de** belî yo.¹²⁹

f. A roje eskeran Çemê Hewma **de** erebeyê Naîfî ...¹³⁰

¹²⁵ Ehmedê Xasî 2013, r.11.

¹²⁶ Ehmedê Xasî 2013, r.15.

¹²⁷ Ehmedê Xasî 2013, r.16.

¹²⁸ Malmîsanij (Arêkerdox) 2000, r.23.

¹²⁹ Malmîsanij (Arêkerdox) 2000, r.155.

¹³⁰ Nêşite 2012, r.39.

5.2.3. dir/reyde/ya/de:

a. Labelê kam o kû namey yê hema,

Ame nûştiş nameyê to **dir** bi ma?"¹³¹

b. Dar û ber pêro te **dir** bermay bi hal,

Hem çîqa heywanî der sehl û cibal.¹³²

c. Dostê xwu **reydi** se kenî biki, al-vêr meki; be'dî to pîs beno.¹³³

d. ... wazeno ke aye **reyde** embazîye bikero.¹³⁴

e. Hûmay to **di** ardim biko.¹³⁵

f. Ehmed mi **dir/reyde/ya/de/di** ame Dîyarbekir.

5.2.4. ra:

Mi **ra** biewnî/Heywanî ko **ra** çerenî.*

a. Hendî ma Şeytanî **ra** perwayî çî yo?

Yo kû to **ra** tim bîyo, bêhêvî yo!¹³⁶

b. Henkî nan û sole zî rone, bira,

Vende çend merdiman, qasê xwu **ra**.¹³⁷

c. 'Illeto yew zî dunya bîbî zelum,

¹³¹ Ehmedê Xasî 2013, r.23.

¹³² Ehmedê Xasî 2013, r.37.

¹³³ Malmîsanij (Arêkerdox) 2000, r.140.

¹³⁴ Gündüz (Editor) 2008, r.14.

¹³⁵ Malmîsanij (Arêkerdox) 2000, r.194.

¹³⁶ Ehmedê Xasî 2013, r.12.

¹³⁷ Ehmedê Xasî 2013, r.13.

Kufr û şirkî **ra** hema bîbî tamam.¹³⁸

d. ‘Emrê yê weqto tamam bî şeş serrî,

Amîna zî şî dunya **ra** ay serrî.¹³⁹

e. Mi **ra** honeno (honêno) heweno,¹⁴⁰

f. Adir **ra** pirên nêbeno.¹⁴¹

5.2.5. rê:

Hagîdarî **rê** mend/Wa ma **rê** bo.*

a. Rebbî, hemd û şukrî ancax to **rê** bê,

Kîbr û medh û fexrî pêro to **rê** bê.¹⁴²

b. Ger ti yew mewlûd xwu **rê** wendiş bidê,

Lazim o tertîb bizanê, pê bidê.¹⁴³

c. Qedrê yê ger ma bizanin ende bes,

Kafî yo ma **rê** heta axir nefes.¹⁴⁴

d. Qul Zikîfî **rê** se ko?¹⁴⁵

e. Yew Emi **rî/rê** qurban dano,

Gewr û rindê, Emînayê.

¹³⁸ Ehmedê Xasî 2013, r.14.

¹³⁹ Ehmedê Xasî 2013, r.44.

¹⁴⁰ Malmîsanij (Arêkerdox) 2000, r.37.

¹⁴¹ Malmîsanij (Arêkerdox) 2000, r.134.

¹⁴² Ehmedê Xasî 2013, r.11.

¹⁴³ Ehmedê Xasî 2013, r.13.

¹⁴⁴ Ehmedê Xasî 2013, r.17.

¹⁴⁵ Malmîsanij (Arêkerdox) 2000, r.23.

Yew Emi **rî (rê)** qurban dano,

Gewr û rindê, zerîyayê.¹⁴⁶

f. Xwendî xwi **rî (rê)** kêf kenî, hewarê, dayê, mi benî!

Xwendî xwi **rî (rê)** kêf kenî, bawiko bawo, mi benî!¹⁴⁷

5.2.6. ro:

Da mi **ro**./Şiwaneyî bizê xo deşte **ro** yan ko **ro** berdî?*

a. “Es-selatu wes-selamu ya hebîb,

Daîma to **ro** bivarê ya tebîb!”¹⁴⁸

b. . Mîre pirdi b’ ser ra meşo, qatiri b’ pey ra meşo, paşkil dano to **ro**; ver a meşo gaz dono to **ro**.¹⁴⁹

c. Kerre **ro** guneno nêşikiyeno, aw **ro** guneno şikiyêno.¹⁵⁰

d. ... bi rêze danê xortan **ro**.¹⁵¹

e. ... destê xo da sîneyê xo **ro** û ...¹⁵²

f. Destê xwi bidi, ma şêrî eno ko **ro**.

Hero lacek, ma şêrî eno ko **ro**,

Ko rişîşê vareyna bido min û to **ro**.¹⁵³

¹⁴⁶ Malmîsanij (Arêkerdox) 2000, r.52.

¹⁴⁷ Malmîsanij (Arêkerdox) 2000, r.65.

¹⁴⁸ Ehmedê Xasî 2013, r.12.

¹⁴⁹ Malmîsanij (Arêkerdox) 2000, r.150.

¹⁵⁰ Malmîsanij (Arêkerdox) 2000, r.162.

¹⁵¹ Gündüz (Editor) 2008, r.14.

¹⁵² Gündüz (Editor) 2008, r.31.

¹⁵³ Malmîsanij (Arêkerdox) 2000, r.90.

g. Wey la, zerencay mi honîk a cêr (r)o yena.

Wilay çimsiyay mi honîk a cêr (r)o yena.¹⁵⁴

5.2.7. ser o:

Zamayê ma kamcîn kursîye **ser (r) o** ronîşt?*

a. Maneno îne **ser o** şukrê çiman;

Dest û ling û pîya bi e'ezayê bînan.¹⁵⁵

b. Lazim o tertîbê mewlûdî tamam,

Ma **ser o** vacin, bizanê xas û 'am.¹⁵⁶

c. Kam keso kû nêkero sebro kerîm,

Ez go ronî yê **ser o** huzno 'ezîm!¹⁵⁷

d. ... Awka bîrdê ma nobet a.

Yew gilanga mi Xeco'yhet a,

Xeco na ra cinabet a.

Şarî ma **ser o** veta,

Deyri nîya ki zerbet a.¹⁵⁸

e. ... Riwen nanî **ser o**.¹⁵⁹

¹⁵⁴ Malmîsanij (Arêkerdox) 2000, r.83.

¹⁵⁵ Ehmedê Xasî 2013, r.11.

¹⁵⁶ Ehmedê Xasî 2013, r.13.

¹⁵⁷ Ehmedê Xasî 2013, r.26.

¹⁵⁸ Malmîsanij (Arêkerdox) 2000, r.69.

¹⁵⁹ Malmîsanij (Arêkerdox) 2000, r.78.

f. Adir vewr **ser o** veşeno, wel **ser o** nêveşeno.¹⁶⁰

5.2.8. wa/ya:

Goştê rîyê ey bibi tena post û niştîbi esteyanê rîyê ey **wa**. Erjaye çar gedeyan zî zamayê xo **ya** şaweno.*

a. Pereyê xo naylonêko tenikî **wa** pişt û kerd cêbê xo yê zereyî.¹⁶¹

b. ... hetanî aşma adare hetê Lezgînî **wa** nêşêro.¹⁶²

c. Şima çîyêk ma **wa** nêverda.

5.3. NIMÛNEYÊ BAZINEEDATAN

5.3.1. beyntarê/beynateyê/mabênê/mîyanê/orteyê/arayê ...de:

Beyntarê/beynateyê/mabênê/mîyanê/orteyê/areyê Şaribane û Sosine **de** çî esto?*

a. **Beyntarê** teresey û camêrdey **di (de)** yew muy a.¹⁶³

b. **Mîyanê** keyî **di (de)** rona, ...¹⁶⁴

c. ... **mîyanê** qelebalixî **di (de)** mudirî xo vîno.¹⁶⁵

d. ... yew fîrmaya otobusanê **bînatê** bajarê **di (de)**, ...¹⁶⁶

¹⁶⁰ Malmîsanij (Arêkerdox) 2000, r.134.

¹⁶¹ Nêşite 2012 r.23.

¹⁶² Nêşite 2012, r.28.

¹⁶³ Malmîsanij (Arêkerdox) 2000, r.135.

¹⁶⁴ Malmîsanij (Arêkerdox) 2000, r.205.

¹⁶⁵ Gündüz (Editor) 2008, r.18.

¹⁶⁶ Gündüz (Editor) 2008, r.19.

- e. Pîrê min, **mabênê** kerwayan **de** zewaj caîz o yan ney?¹⁶⁷
- f. Şewêk **beyntarê** xo **de** qalî kenî, ...¹⁶⁸
- g. Evdila Beg herbî **beyntarê** Îran û Osmanîyan **de** kişîyayo.¹⁶⁹
- h. **Bêntarê** mi û Ehmî **de** yew mesela esta ...¹⁷⁰

5.3.2. bi ... ra:

Ez **bi** Zerrîweşî **ra** ameya.*

5.3.3. bi ... wa:

Mewlîdê kirdî **bi** CD **wa** newe ra çap bi.*

- a. Mêrdek **bi** istorda xo **wa** çöşmeyê qabaqêr di şî-ame.¹⁷¹
- b. Reyna bi fesal **bi** ê naylonî **wa** pereyî piştî û eştî cayo verênî.¹⁷²
- c. **Bi** zaf û zîrçê xwu **wa** ame keyê ma.

5.3.4. di ... de:

“Va ‘z **di** emrê to de **wa**...” (Ehmedê Xasî),*

- a. Xaliqî hur dî muzeyyen kerdibî,

¹⁶⁷ Gündüz (Editor) 2008, r.44.

¹⁶⁸ Gündüz (Editor) 2008, r.62.

¹⁶⁹ Kuriş, “Tarîxê Ma ra Çend Portreyî”, **Kovara Nûbiharî**, r.21.

¹⁷⁰ Nêşite 2012, r.30.

¹⁷¹ Malmîsanij (Arêkerdox) 2000, r.236.

¹⁷² Nêşite 2012, r.29.

Hem **di** cennet **de** muxeyyer kerdibî.¹⁷³

b. Şeyxê Besrî vato, “Zeyd kohê Uhud

Zerdê ma bê, go **di** yew mewlûd **de** bid.”¹⁷⁴

c. Be‘dê cû va, “Ey qelem nûştiş bike!”

Va “ ‘z **di** emrê to **de** wa, vatiş bike!”¹⁷⁵

d. Va “**Di** bextê ay Muhemmedî **de** de wa,

Min ‘efû ke Rebbî, bêçare wa!”¹⁷⁶

d. **Di** ney hîrê nimûneyê corinan **de**, balkêşîyêke asena.¹⁷⁷

e. **Di** Dinya **de** to pîsêrî jo çinî yo.

5.3.5. herinda (ca) ... de:

Ez **herinda** (**cayê**) şima **de** bî qebul nêkena.

Zinarî **cayê** peran **de** dolar da.

Herinda Şêrkoyî de birayê ey hame.

5.3.6. hetê ... ra:

a. **Hetê** rayîrî **ra** na rey tecelîya ey bibî ...¹⁷⁸

¹⁷³ Ehmedê Xasî 2013, r.29.

¹⁷⁴ Ehmedê Xasî 2013, r.16.

¹⁷⁵ Ehmedê Xasî 2013, r.23.

¹⁷⁶ Ehmedê Xasî 2013, r.30.

¹⁷⁷ Gultekîn 2010, r.47.

¹⁷⁸ Nêşite 2012, r.24.

b. Vayêko honik **hetê** vakurî **ra** bi boya bostanan û bi boya zergunîye amêne û **hetê** Polatlîya Anqara **ra** kerdêne war şîyêne.¹⁷⁹

c. ... **hetê** Lewedê Zincî **ra** şona, hewnêna ki çi bewnîyû?¹⁸⁰

d. Lîy enî ki fekê xwibena **hetê** hakandê cey **ra**, serey ca dekwenû miyandê faqandê cey,¹⁸¹

Şîyar **hetê** corî **ra** ame.

5.3.7. pey ... de:

Xalê ey **pey** banî **de** ronştibi.*

a. Hesenê mi **pey** nê emrî **de** ma ko senî bê!¹⁸²

b. ... Xalê xo yo ke **pey** ey **de** ronîşte bi.¹⁸³

5.3.8. peyê/pê/peynî ... ra:

Kutik/sipe **peyê/pê/peynî** berî **ra** vejîya.*

a. Zerqê tîje, serê koyê **pey** Xiraban **ra**, hêdî-hêdî vejîyêne.¹⁸⁴

5.3.9. qandê ... rê:

¹⁷⁹ Nêşite 2012, r.47.

¹⁸⁰ Malmîsanij (Arêkerdox) 2000, r.210.

¹⁸¹ Malmîsanij (Arêkerdox) 2000, r.210.

¹⁸² Nêşite 2012, r.8.

¹⁸³ Nêşite 2012, r.13.

¹⁸⁴ Nêşite 2012, r.40.

Saqî, bide mi **qandê** Homayî rê.*

5.3.10. **semedê ... ra:**

Ez **semedê** to **ra** ameya.*

a. **Semedê** çî **ra**? ... **Semedê** aye **ra** ez bi heyecan a!¹⁸⁵

b. Ê kû cay **semedê** to **ra** bêrî, to hin dî ki ma zî kiştî.¹⁸⁶

c. Êdî ey zî **seba** înan **ra** dest nêdabî yew muye zî.¹⁸⁷

d. ... **semedê** birayê xwi **ra** nê, **semedê** veşê (veşayîşê) serey xwi û destanê xwi **ra** barreno, vano:¹⁸⁸

Kitabê M. Çemî de mîyanê kategorîya ke vato “**edatê ke ca nîşan danê** (Çekimli hal-**halo ante**)” tayê edatî estê merdim eşkeno înan zî tîya de binusno.

beynatey... ra/beyntarê... ra

mabênê... ra

wertê... ra

... **mîyanê** kaykerdoxan **ra** vîyart û şî ...¹⁸⁹

beynatey... ro/beyntarê... ro

mîyanê...ro

wertê... ro

¹⁸⁵ Malmîsanij (Arêkerdox) 2000, r.231.

¹⁸⁶ Malmîsanij (Arêkerdox) 2000, r.209.

¹⁸⁷ Nêşite 2012, r.40.

¹⁸⁸ Malmîsanij (Arêkerdox) 2000, r.229.

¹⁸⁹ Nêşite 2012, r.25.

mîyanê/mabênê... ro

zerreyê/zerrê... de/zerre de

Kitabanê xebatkaranê zıwanî yê kirdan de, derheqê bazineedatan de zaf farqê estê. Mesela kitabê Sebahattîn Gultekînî de kategorîya bazineedatan çinî ya. Kitabê Roşan Lezgînî de tena hîrê nimûneyî estê. La kitabanê bînan de nimûneyî zaf ê.

PEYNÎYE

Hetê kategorîzekerdişê edatan ra mîyanê xebatkaranê ziwani yê kirdan de farqê pîlî estê. Sebahattîn Gultekîni kategorîzekerdiş de behsê **xwuserî û nêxwuserî** kerdo. Feqet zafê xebatkaranê ziwani edatî wina kategorîze kerdê: **Veredatî, peyematî û bazineedatî/veredatî û peyematî pîya**. Reyna, mîyanê şarê kirdan de goreyê mintiqayan ra cîya bi cîya edatî estê. Nê farqan mîyanê kirdan de hetê yewbînan ra famkerdiş de zehmetî veta meydan.

Kirdkî de derheqê edatan de çîyo ke merdim bieşko rehet vajo no yo: Edatan ser o hema standardêk nêvirazîyayo. Hetê tesbîtkerdişê edatan de zî mîyanê xebatkaranê ziwani yê kirdan de farqê muhîmî estê. Hetta ameyo tesbîtkerdiş ke tayê cayan de fikrê ke zitê/eksê yewbîni yê estê. Mesela derheqê edatê **pê**'yî de zaf farqî estê. Reyna derheqê sey çekuyanê **heta/hetanî, dir, zî** de zî farqî estê. Mamosta Mûnzûr Çemî derheqê tayê edatan de bahsê negatîfiye kerdo. Nê çî zî nîşan danê ke edatî hema standardîzasyonî ra dûrî yê.

Kirdkî de xebatêkê edatan ser o ameyê kerdiş merdim bido têver bi pêroyî nê edatî vejîyenê meydan:

Veredatî: bê, bi, di, fenê/sey, heta/heya/hetanî, pê, seke, qandê/seba/semêd/semêdê, qasê, ro, tewlî/tevê, ver bi

Peyematî: a, de, dir/rejde/ya/de, ra, rê, ro, ser o, wa/ya

Bazineedatî:

beyntarê/beynateyê/mabênê/mîyanê/orteyê ... de

bi ... ra

bi ... wa

di ... de

herinda/ca ... de

hetê ... ra

pey ... de

peyê/pê/peynî ... ra

qandê ... ra

semedê ... ra

Çekuyê ke ser o tam muşterekî çinî ya, ma vajin sey, **beyntar, bin, cêr, cor, dima, mîyan, pey/peynî, ser, vernî, zere** ûsb. mîyanê kategorîyan de nêususayî. La seba ke kategorîya bazineedatan de ê yê ke zaf nusyayê mi zî nuştî.

Zazakî de edatî zereyê cumleye de zaf cayo mûhîm gêrenê. Zereyê cumle de hetê manayî wa giranî edatan ser o ya. Eger edatî cayê xwu de û raşt nêrê xebitnayîşî manayê cumleye xeripîyeno. Ge-ge mana bin ra nîno famkerdişî. Yanî manayê cumleye ser û bin beno. Nê çî dîyalektê kurdkî yê bînan de zî xwu nîşan danê.

Derheqê edatan de tarîfê ke ameyê kerdiş tam cayê xwu nêgêrenê. Yanî tarîfkerdişê edatan goreyê çekuyanê edatan ra teng mendo. Belkî hewceyo ke siba roj edatî newe ra tarîf bibê. Bi taybetî çekuyêkê eslê înan nameyo la manayê înan tayê vuryayo û rolê edatan giroto tewerê tarîfê edatan de manenê. Çimkî manayê înan esta. No tarîf ganî goreyê çarçewayê dîyalektanê ziwane kurdkî û ziwane bînan ra virazîyo.

Seba ke zazakî nêbîya ziwane nuştîş sey çekuyanê bînan çekuyê edatî zî zaf deforme bîyê. Reyna, goreyê mintiqayan ra cîya bi cîya edatî virazîyayê. Mesela edatê, **de, dir, reyde, ya** manayê înan/karê înan seypê yo. Yanî zereyê cumleye de bi eynî mana yenê xebitnayîşî. Gava ke zereyê cumleye de edat bibedilîyo famkerdişê cumleye beno zor. Loma mîyanê mintiqayan de yewbînan ra famkerdiş ewro bîyo zor.

Reyna merdim eşkeno vajo, seba ke zazakî nêbîyo ziwanê nuştişî binê tesîrê ziwananê bînan de mendo. Loma ziwananê bînan ra zî zaf çekuyê edatî kewtê mîyanî zazakî. Sey nimûneyî; **badê/bahdê, beyntar, derheq, gore, heta/hetanî, mabeyn, orte, sedem** ûsb. Nê çî zî mîyanê mintiqayan de yewbînan ra famkerdiş kerdo zor. Mesela eynî mana de tayê mintiqayan de çekuyê **beyntarî**, tayê mintiqayan de çekuyê **mabeyn/nabên**, tayê mintiqayan de **orte/werte**, tayê mintiqayan de zî çekuyê **mîyanî** yena xebitnayîşî.

Peynî de, dîyalektê zazakî de derheqê edatan de merdim eşkeno bi kilmî, sey maddeyan nê çîyan vajo:

1) Edatan ser o standardîzasyonêk çinî yo.

2) Kategorîzekerdişê edatan de tayê farqî estê.

3) Seba ke ziwanê nuşteyî/nuşteki erey mendo çekuyî zaf deforme bîyê û tayê çekuyî zî binê tesîrê ziwananê bînan de mendê. Nê çîyan zî mîyanê mintiqayan de famkerdiş kerdo zor.

4) Tarîfkerdişê edatan goreyê xebitnayîşê edatan ra ewro zaf teng mendo.

5) Tayê çekuyan ser o cîya bi cîya fikrî estê. Yanî kamcîn çekuyî edat ê, kamcîn çekuyî edat nîyê tam cayê xwu de nêgirewto.

Nê çîyê ke ameyê tesbîtkerdiş û bi maddeyan rêz bîyê zazakî de rewşê edatan nîşan danê. Standardîzasyon çinî yo. Goreyê mintiqayan ra farqî zaf ê û çekuyî deforme bîyê. Gramer cayê xwu de tam nênişto ro. Nê çîyan ra bi kurte ma eşkenê derheqê edatan nê çî vejîn meydan:

Seba ke edatan ser o standardîzasyonêk çinî yo, tayê çîyê elûzîyayeyî vejîyayê meydan. La seba ke mektebê ma çinî yê no çî zî normal o. Siba roj mektebî abibê, gramerê zazakî mekteban de bêro wendiş-nuştiş do standardîzasyonêk virazîyo. Loma ma rê, sey resmîyetî mektebî lazim ê. Çareyê yewbînan ra nêfamkerdiş û çekuyî ke deforme bîyê reyna mektebê.

Kategorîzekerdişê de ma eşkenê edatan sey hîrê birrî (veredatî, peyedatî,

bazineedatî) qebul biker. La beno ke siba roj kategorîyê sey “edatê komî/grûbî, edatan de halo xwuser, halo nêxwuser, halo anteye” ûsn vejîyê meydan.

Çekuyê ke ziwananê bîyanîyan/xerîban ra ameyê û manayê înan de çekuyê bi kirdkî bibê, ganî çekuyê kirdkî bêre tercîhkerdiş. Seba nimûneyî, cayê çekuya “badê/badî/bahdê/bahdî” de, goreyê manayê cumleye ra çekuyê “dima/pê/pê ra”; cayê çekuyê “beyntar/mabeyn/orte”yî de çekuyê “mîyan”î; cayê “mi gore”yî de “bi min” bêre xebetnayîşî. Dima, ganî gramerê dîyalektanê kurdî, sey kurmancî-soranî û ziwananê bînan ra îstîfade bêro kerdiş. Eger hewce bikero çarçewayê edatan tayê bêro hîrakerdiş yan zî newe ra virazîyo. Bi no şekil û bi xîrê/xeyretê heskerdixanê ziwane ma û şarê ma, do ziwane ma zî ruknanê xwu ser o ronîşo û rîyê dinya de cuyayîşê xwu dewam bikero.

ÇIMEYÎ

ASPAR, Seîd; “Çimê Ma Roşt Bo”, **Kovara Şewçilayî**, Berdan Matbacılık, Hûmare 1, İstanbul 2011.

CANŞAD, Murad; “Romananê Mehmed Uzunî de Enstrumanê Muzîkî”, **Kovara Şewçilayî**, Berdan Matbacılık, İstanbul 2011.

ÇEM, Munzur; **Türkçe Açıklamalı Kirmancca (Zazaca) Gramer**, Deng Yayınları, İstanbul 2013.

ESPAR, J. Îhsan; **Dilopê Zerrî**, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul 2008.

GULTEKÎN, Sebahattîn; **Ro Ser Zarawaya Kirmanckî Xebata Grameri**, Weşanên Enstituya Kurdî ya Stanbolê, İstanbul 2010.

GÜNDÜZ, Deniz (Edîtor); **Nika Wextê Huyayîşî yo**, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul 2008.

GÜNDÜZ, Deniz (Edîtor); **Rastnuştîşê Kirmanckî (Zazakî)**, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul 2012.

GÜNDÜZ, Deniz; **Türkçe Açıklamalı Kürtçe Kirmancca/Zazaca Dil Dersleri**, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul 2013.

KARAKAŞ, Huseyîn; “Hêliyê Serê Tûjik Bavayî”, **Kovara Nûbiharî**, Hûmare 118, Cild 15, İstanbul 2012.

KURIJ, Seyîdxan; “Tarîxê Ma ra Çend Portreyî”, **Kovara Nûbiharî**, Hûmare 118, Cild 15, İstanbul 2012.

LESCOT, Roger (Arêkerdox); **Memê Alan**, (Kurmanckî ra Tadayîş) Roşan LEZGÎN & N. Celalî, Weşanxaneyê Roşna, Dîyarbekir 2014.

LEZGÎN, Roşan; **Dersê Ziwani**, Weşanxaneyê Roşna, Dîyarbekir 2012.

MALMÎSANIJ (Arêkerdox); **Folklorê Ma Ra Çend Numûneyî**, Berdan Matbaacılık, İstanbul 2000.

MALMÎSANIJ, M.; **Kurmanca ile Karşılaştırmalı Kırmanca (Zazaca) Dilbilgisi**, Vate Basın Yayın Dağıtım (Weşanxaneyê Vateyî), İstanbul 2015.

NÊŞITE, Mehmûd; **Çaketo Sipî**, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul 2012.

PAMUKÇU, Fahri; **Gramerê Zazaki-Zuwanrêznayî**, Weşanxaneyê Tîjî, İstanbul 2001.

QANATÊ KURDO; **Rêzimana Kurdî Kurmancî-Soranî**, (Soranî ra Tadayîş) Zülküf Ergün, Weşanxaneyê Nubiharî, İstanbul 2013.

SERTKAYA, İlhamî; **Sosine û Gulîzare**, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul 2013.

TOPAÇ, Bedriye; **Bero Sûr**, Weşanxaneyê Roşna, Dîyarbekir 2012.

TURGUT, Harun; **Türkçe Açıklamalı Zazaca Dilbilgisi**, (Weşanxane nêameyo nuştîş), Almanya 1997.

EHMEDÊ XASÎ; **Mewlidê Kirdî**, (Amadekar û Tadayîş) Roşan LEZGÎN, Weşanxaneyê Nûbiharî, İstanbul 2013.

YILDIRIM, Kadri; **Temel Alıştırma ve Metinlerle Kürtçe Dilbilgisi (Kurmanci Lehçesi)**, Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü Yayınları, Mardin 2012.



2018-02-07 13:45:19.0

Benzerlik Raporu

Muhammed Emin Kaçan adına yüklenen "Zazacada Edatların Kategorize Edilişi ve Zazaca Metinlerinden Edat Örnekleri -(Zazakî de Kategorîzekerdişe Edatan û Metnenê Zazakî Ra Nimûneyî)" isimli eserin benzerlik testi yapılmıştır. Test sonucunda benzerlik oranı %2 bulunmuştur.



Doküman Kodu : 5350_1518007511

Doküman Kodu ile bu dokümanın doğruluğu
<http://app.intihal.net/kontrol.jsp> adresinden kontrol edilebilir.

Öpr. pîre İbrahim Bingöl

Zazacada Edatların Kategorize Edilişi ve Zazaca Metinlerinden Edat Örnekleri -(Zazakî de Kategorîzekerdişe Edatan û Metnenê Zazakî Ra Nimûneyî)

Yazar : Muhammed Emin Kaçan Sayfa Sayısı : 95 Kelime Sayısı : 17985 Karakter Sayısı : 110359


ORJİNALLİK RAPORU

BENZERLİK ENDEKSİ	İNTERNET KAYNAKLARI	YAYINLAR	ÖĞRENCİ ÖDEVLERİ
%2	-	-	-

BİRİNCİL KAYNAKLAR

1	Mardin Artuklu Üniversitesi - Mewlidê Mela Ehmedê Xasî:'Mewlidu'n-Nebîyyî'l-Qureyşîyyîl'(Metn-wekenitîş) Mela Ehmedê Xasî'nin mevlidi:'Mewlidu'n-Nebîyyî'l-Qureyşîyyîl'(İnceleme-metin)	<%1
2	Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi (Dergipark) - Zazakî De Çekuyê Diletî	<%1
3	Mardin Artuklu Üniversitesi - Mewlidê Usman Esad Efendiyo babijî - Bîyîşa Pêxemberî - metn û wekenitîş Osman Esad Efendi'nin mevlidi - Bîyîşa Pêxemberî - metin ve inceleme	<%1
4	Mardin Artuklu Üniversitesi - Kirmanckî (Zazakî) de pêveronayîşê fekê Çewlîgî û Gimgimî Kırmancca (Zazakî) da çewlîg (Bingöl)ve Gimgım (Varto) ağızlarının karşılaştırılması	<%1
5	Mardin Artuklu Üniversitesi - Folklorê kirmancan (Zazayan / Kırdan / Dimilîyan) ser o cigêrayîşê Kırmancların (Zazaların/Kırdaların/Dimilîlerin) folkloru üzerine bir araştırma	<%1
6	Muş Alparslan Üniversitesi - Lêkolîneke lı ser motîfên lawıran ên ku dı berhema M. Emîn Bozarslan ya rêzeçîrokên lawıran a bı navê 'Meselokên Lawıran' de cih dıgırın M. Emin Bozarslan'ın 'Meselokên Lawıran' adlı hayvan masalları serisinde yer alan hayvan motifleri üzerine bir inceleme	<%1
7	Çağ Üniversitesi - Intercultural competence and its reflection in the beliefs of Turkish teachers of English with regard to their teaching practices Kültürlerarası edinç ve bunun öğretim uygulamalarına ilişkin olarak İngilizce öğretmenlerinin inanışlarına yansımaları	<%1
8	Orta Doğu Teknik Üniversitesi - Graffiti and urban space in İstanbul İstanbul'da grafiti ve kent mekanı	<%1
9	Çağ Üniversitesi - Blending with purpose: Teachinh writing courses with online and traditional classroom instruction Amaç doğrultusunda harmanlama: Yazma derslerinin uzaktan ve gelenkssel sınıfıçı eğititle verilmesi	<%1
10	Mardin Artuklu Üniversitesi - Veracêkerdena gramerê zazakî û kurmancî: Diyalekt, alfabe û fonetik, morfolojî Karşılaştırmalı zazaca ve kurmancî grameri: Diyalekt, alfabe ve fonetik, morfolojî	<%1

11	WEB - Internet Source	<%1
12	WEB - Internet Source	<%1
13	Mardin Artuklu Üniversitesi - Ji bo zarokan di fêkirina Kurdî de rola mamikan: Vekolîn - senifandin Çocuklara Kürtçe öğretiminde bilmecelerin rolü: İnceleme - sınıflandırma	<%1
14	Polis Akademisi Başkanlığı - Türk kamu yönetiminin teftiş kurulları yoluyla denetimi: SGK ve EGM Teftiş Kurulları örneği Audit of Turkish public administration through inspection boards: The cases of Social Security Institution (SSI) and Turkish National Police (TNP) Inspection Boards	<%1
15	Mardin Artuklu Üniversitesi - Mewlidê Mela Ehmedê Xasî: 'Mewlidu'n-Nebiyî'î-Qureyşiyî' (Metn-wekenitîş) Mela Ehmedê Xasî'nin mevlidi: 'Mewlidu'n-Nebiyî'î-Qureyşiyî' (İnceleme-metin)	<%1
16	Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi (Dergipark) - Zazakî De Çekuyê Diletî	<%1
17	Mardin Artuklu Üniversitesi - Kirmanckî (Zazakî) de pêveronayîşê fekê Çewlîgî û Gimgimî Kirmancca (Zazakî) da çewlîg (Bingöl)ve Gimgim (Varto) ağızlarının karşılaştırılması	<%1
18	WEB - Internet Source	<%1
19	Mardin Artuklu Üniversitesi - Ji bo zarokan di fêkirina Kurdî de rola mamikan: Vekolîn - senifandin Çocuklara Kürtçe öğretiminde bilmecelerin rolü: İnceleme - sınıflandırma	<%1
20	WEB - Internet Source	<%1
21	Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi (Dergipark) - KÜRTÇE'DE AKUZATİF-ERGATİF ÖZELLİK	<%1
22	Yüzüncü Yıl Üniversitesi - Berhevxitna cînavkên kesî di Kurmanciya jorîn û jêrîn de Yukarı ve aşağı Kurmancî'deki şahıs zamirlerinin toplanması	<%1

ögr. pır. İbrahim Bingöl




T.C

Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiyede Yaşayan Diller Enstitüsü

Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Yüksek Lisans Tezi

**ZAZACADA EDATLARIN KATEGORİZE
EDİLİŞİ VE ZAZACA METİNLERDEN EDAT
ÖRNEKLERİ**

Muhammed Emin KAÇAN

14711015

Danışman

İbrahim BİNGÖL

Mardin 2018